DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

EDWARD PETÎŞKA

# MÎTOLOJIYÊN MEZOPOTAMYA

APEC


7

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://ranfey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

EDWARD PETÎŞKA

# MÎTOLOJIYÊN MEZOPOTAMYA



Werger: Cemal Batun

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

APEC

# Naverok

*Mezopotamya - Edward Petişka* ............................5
*Disa li ser Mezopotamya - Cemal Batun* ................ 13

*MÎTOLOJÎ*
*YEKEM* ................................................17
*DUWEM* ...............................................28
*SÊYEM* ................................................39
*ÇAREM* ................................................49

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Weşanên APEC - Tryck & Förlag
Weşan no : 39

Çapa yekemîn :İlon 1993

APEC - Tryck & Förlag
Box 3318
163 03 Spånga - Sweden
Tel : 08 / 761 81 18

Nivîskar : Edward Petîşka
Werger ji bulgarî : Cemal Batun
İlustration : Vanya Lapardova - Batun

© APEC - TRYCK & FÖRLAG

Teknîkerê pergela berg : Vanya Lapardova - Batun

**ISBN : 91 - 87730 - 39 - 9**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MEZOPOTAMYA

Elen ' an ( yunaniyan ) ew wusa binav kirine. Navê wê tê mana - xaka navbera du çeman. Qraliyetên Mezopotamya yên kevnare li vir, di navbera du çemên`navdar - Dîcle û Firat de pêkhatine û hilweşiyane.

Em ji valayiya qamîşên Firatê bikevin nav dîroka hezarên salan, ên ku me ji Mezopotamya ya mezin û kevnare dûr dixin.

Li ser rûyê şahîk ê Firatê keştî digerin, ên ku ji darên çaman hatine çêkirin û bi çerm hatine jidandin. Her wusa keştîyên biçûk bi wan ve ne, yên ku bi çermên beranan ve hatine pêçandin, ji bo ku siviktir bibin. Li ser pêlên nêzîkê beravê, selikek ji qamîşan hatî çêkirin, bi vir û wir de diheje. Aliyê hundirû yê selikê bi benîştê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çamê ve pêçaye ji bo avê derbas neke. Di selikê de zarokek şîrê heye. Dayika wî, bi dizî ew teslîmê ava Firatê kiriye, ku wî ber bi çarenûsek nû ve bibe. Ji beravê masîvanê bi navê Akkî, selika bi zarokê ve dibîne, lê meyze dike. Ew bi darek dirêj dixwaze selikê ber bi xwe ve bikşîne. Dawî wê dikşêne ber bi xwe ve û zarokê ji selikê derdixe û bilind dike. Bi vî awayî li gor mîtolojiyê masîvanê hejar dikeve dîroka welatê xwe de. Lawê ku ji ava Firatê digihe destê Akkî, li ba wî mezin dibe û fêrî bahçewanîyê dibe. Xortek delal û zîrek jê derdikeve. Piştî Xweda İştar dildikeve wî, alîkariya wî dike ku derbikeve ser textê qraliyê û serfiraziyên mezin hemberê dijminan bidest bixe.

İro, vêce em dizanin, ku qralê ev destan li ser tê gotin, bi rastî jî jiyaye. Navê wî Sargon bûye û împeratoriyek mezin sazkiriye. İro em dikarin nîvîsên ji dema Mezopotamya ya kevnare bixwînin, yên ku ji hezarên salan ve ketibûne jibîrkirinê de, her wekî yên Egîpetê ( Misir a kevn ).

Gava em pişta xwe didin Firatê, em bahçe û daristanên ji darên xurman ên delal û bi plan ên Fînîkiyan bibînin. Di dema berê de, her wekî nuha, dara xurmeyê ya Fînîkî danek tebîatê ya herî xweşik ji van cîhan re bûye. Ji ava xurmeyên wê, ji hingê ve bi hostayî hingiv û ava tirş çêkiribûne. Ji dendikan xwarin ji bo heywanên xwe derxistine ; pelên darê jî bikar anîne. Her çend di dara xurmeyan de nîmetên zêde nebin jî, li vê de li wan meyze kirine. Ji darên wan bi rastî feydeyên mezin dîtin e. Dar ji bo gelek tiştan bikar anîn e - ji bo nîmetên xwarinî û yên nivîskî...


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Em ji daristan a darên xurmeyan derbas dibin û ji dur ve bajêr dibînin. Dîwarên bajêr ên bilind û avayiyên parastinê li derdorê. Ji bo bajarê kevnare, em dikarin ji derî yê bi darên spîndaran çêkirî û bi baqir ve hatî jidandin, derbas bibin. Kolanên ji xelkê dagirtî, bi qîrên bazirganan, bi derbên çakûçan ên hesinkaran, bi lêdana dahol û zingilan, bi zîvirandina dolaban ( tekerlek ) ji me re didin xuyandan, ku em nêzîkî dukanên esnafan dibin. Gava em serî hildin em ê avayiyek bilind û ezîm bibînin . Bilind , bi ser hemû xanîyên bajêr ve, minareyên Zîkuaratê diyar in, ên ku li kesên xwedî bawerî û îmanê tesîrek mezin dikin. Lê mînare û avayiya herî navdar û mezin a li bajarê Babîlonê ye - Keliha Babîlon e. Li gor destanên herî kevn ev avayî ji alî Xwedêyan ve hatiye çêkirin. Bi vî awayî hurmet û rumet, ji bo Xwedayê herî bilind ê Babîlonê - Marduk re hatiye nîşandan, ji bo ku ew di cîhê herî bilind de bijî. Lê, di rastiyê de ev avayî ji bal dîl' an ( êsîran ) ve hatiye çêkirin, ên ku di wê demê de, di avakirina hemû avayiyan de hatine bikaranîn. Hemû karên zexmet bi wan hatine kirin.

Di derdora kelihan de, avayiyên din jî çêkirine, ji bo ku di rojên cêjnên mezin de bi mirîdan bên dagirtin. Mirîd di van avayiyan de hatine bicîh kirin, li wir razan e û xwe amadeyî pîroziyên cêjnan kirin e.

Navdariya van bajarên ezîm, ji zûve derbas bûye. Ew hatine jibîr kirin. Ew tiştên xwendevanên bi meraq lê geriyane û peyda kirine di Zabûr, Tewrat, Încîl an Quran ên kerîm de, an jî di nivîsên nivîsvanên kevnare de, dijbehin çîrokan.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bi awayekî lêgerînek fereh û kur, di sedsala derbasbûyî ( sedsala XIX - an ) de arkeologên Ewropayî bala xwe dane vî cihê bi dewlemendiyên senet, dîrok, arkeolojî û hwd. dagirtî. Ev cîh ên ku malê tevayiya insaniyetê ne û di nav erdên împeratoriyên kevnare yên Mezopotamya de bûn e.

Bi alîkariya bi hezarên karkerên cîh, arkeologan dest bi kolanên xwe kirin e. Ji destpêkê ve wan dîtiye, ku ev avayiyên ezîm û kevn ne tebîî ne. Li ser mainî ( kalıntı) yên dîrokî, bi sedên salan, di bin tesîra bûyerên tebîî de - baran, befr, erdhejîn û hwd. qum û ax hatiye komê û ew di bin wan de man e.

Di rojên destpêkê de, pîsporên dema nû dilşad û kêfxweş bûne. Mainî yên heykelan, skulpturan, peykeran, çekan, kevirên bi qiymet, wêne yên li ser ferşikên ( kevirê pehn û şahîk ) ji xeriya sor peyda kirine. Bi vî awayî wan bi şiklek berketî bala xwe ne daye gelek ferşikên , ku li ser wan îşaretên eceb nivîsandî ne. Ev îşaretan, wekî dewsê piyên çûkan ji wan re hatine xuyakirin û qet tiştek ji wan fam nekirine. Kesên cara pêşîn ev ferşikan girtine destên xwe nizanîbûne, ku di destên xwe de nivîsa kevnare ya ku bi awayê nameyên dîrokî bûn e digrin.

Gelên ku di Mezopotamya de jiyane, nivîsa bizmarî ji Şumeran fêr bûne, yên ku runiştvanên xaka bakûrê Mezopotamya' yê bûne. Lê, xerîya sor ( seramîk ) ?

Li Mezopotamya' yê gelek dar û text nebûne. Lê tu bê çiqas , xerîya sor hebûye. Bêguman ew jî bi destan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çêkirine. Xerîya sor ji ber çemên Dîcle û Firatê peyda kirine. Ji xerîya sor kerpîç û kiremêt çêkirine, ew li ber tava rojê hişkkirine û paşî jî ew li ser agir germkirine. Ji xerîya sor keramîk, teyfik, cêr, lampa û gelek tiştên din ên pêwist ji xwe re çêkirine.

Li ser xerîya sor nivîsandine.

Nivîsvanê Babîlonî yan ên Şumerî di destê xwe de kerpîça tenik a ji xeriyê sor çêkirî girtiye - bi taybetî jî yên ne mezin - û li ser nivîsandiye. Pênûsa wî jî qamîş a tujkirî bûye. Di destpêkê de nivîs wekî wêneyan bûye, her çûye hatine hesanîkirin. Heta ku ji nivîsa şeklê wêneyan derbasî şeklê nivîskî bûyê, lê dîsa jî bi mezinbûna cuda "nivîs" hatiye kirin. Ji van nivîsên li ser ferşikên bi mezinbûnên cuda cuda, bîblîotekên gelekî mezin ava kirine. Ji wan dewlemendiyên insaniyetê, sed xwezî jê re ku beşek biçûk maye, yên ku edebiyat, resim û heta hin ji wan rêziman û ferheng jî di nav wan de ye. Di Mezopotamya kevnare de nuha tê zanîn, ku destpêka ilmên giring - wekî matematîk, geometrî, medicin ( TIP ) û astronomî hatiye danîn. Veqetandina rojê ji bo dwanzdeh, ya şev û rojê ji bo bîst û çar, her wekî veqetandina salê ji bo dwanzdeh mehan dîsa ji şaristaniya Mezopotamyayê gihiştiye heta roja me.

Ji xwendin a nivîsa nameya bizmarî re sebr û hewldanek giring pêwist bûye. Ji bo vê jî pîspor û zanayên ilmî bi hejmarek zêde hemû zanabûna xwe serfkirin e. Bi vî awayî, zanistiya li ser dunyayê ya ku heta nuha ji alî Incîlê ve dihat zanîn, şiklek nû girt.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mîtolojiyên, ku hûnê di vê pirtukê de li ser Mezopotamya bixwênin, ji nivîsa nameya bizmarî hatine wergerandin. Beşin ji wan xwendina wan gelek zexmet bûye, beşin xesar dîtine û nehatine xwendin. Zêdeyên wan jî Şumerî ne. Ev mîtolojî xwedî dîrokek gelek gelek kevn û xwedî giringiyek mezin in. Navên ku hûnê di van de mîtolojiyan de bixwînin Akadî ne. Ev mîtolojîyan ji Şumeran gihiştina Akadîyan, paşî xwe gihandine dema Babîlon û Asurîyan û her çûne van mîtolojiyan naverokek ferehtir girtine. Her wusa jî bûne malê tevayiya Mezopotamyayiyan.

Xwedayên Mezopotamyayîyan ji zilma xwedayên din hatine kuştin. Şiklên wan wekî yên insanan bûye û kirinên wan jî wekî yên insanan bûn e. Şer kirine, zewicîne, zarokên wan çêbûne û ferqa wan ji insanan tenê di jîrbûn û zanabûna wan a " netebîî " de bûye. Insanên tebîî li wan bi xeyraniyek mezin temaşe kirine. Bi hêz bûne, mêrxas bûne, zana, xweşik û gelekên caran zalimên wan demên kevnare bûne, ewan karîbûne sêhran bi xwe jî çêbikin.

Lê, ew dema dawî ji wan re jî hatiye - ew dema ku ne sêhr, ne hêz karîbûne alîkariya wan bikin. Ew jî pîr bûne û wekî hemû insanan ji jiyanê koç kirine.

Gava hûnê mîtolojî ya Mezopotamî li ser Etan bixwênin, wê Ikar ê elenî ( yunanî ) werê bîra we.

Ev pirtuka han, armancek wê ku deriyek di ilim de ji nû ve veke tuneye. Nivîskar daxwaz dike, ku bi keda xwe dilxweşiyek bide xwendevanan ku bi dewlemen-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

diya insaniyetê û şaristaniya Mezopotamya nasîn bibin. Ew dixwaze ji we re bibêje, ku zanistî bê sînor e, xweşikbûn bê sînore, daxwaza wekhevî û edaletê bê sînore.

**Edward PETİŞKA**



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DÎSA LI SER MEZOPOTAMYA

Gava ev pirtuka di dest we de bi zimanê bulgarî kete destê min, bê guman ez gelek şa bûm. Tiştên herî giring ji bo min, dokumentelbûn û dîroka mîtolojiyên tê de cîhgirtine bûn. Ev mîtolojîyan ji hezarên salan gihiştibûne roja me - ji xaka nav çemên Firat û Dîcle yê. Li vir, bingeha şaristaniya insaniyetê hatibûye danîn. Xetên pêşîn ên zêdeyên ilmên tebîî, felsefe û edebiyatê di xaka nav çemên Dîcle û Firatê de hatibûye nivîsandin. Çandinî cara yekem ji bal insanan ve, li vir hatibûye kirin. Çemê Dicle û Firatê û xaka di navbera van her du çeman de - Mezopotamya û îro Kurdistan. Ev mîtolojî ji Mezopotamya digihiştin roja me û di nav nîjadên li vir jiyayî, tenê Kurd îro wekî neteweyekî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ji hezarên salên dîrokê ve, xwe digihandin roja me. Ji bo bibin xwediyê mîrasê Mezopotamyayê.

Li ser xaka Mezopotamyayê her wekî di pirtûkê de wê navên wan derbas jî bibe, gelek nîjad jiyane, gelek împeratorî yan mîrîtî hatine damezrandin. Babîlonî, Fînîkî, Aşurî, Akadî, Şumerî, Mîdyayî, Karduxî... Ew Mezopotamya, ya ku bîngeha şaristaniya mirovayetiye bûye, herwekî harî baş ji bal me Kurdan ve tê zanîn, îro sed mixabin bûye cîhê bikaranîna zordariya herî mezin hemberê neteweyê xwediyê vê xakê - Neteweyê Kurd.

Zanîna dîroka xwe, nexasim dîroka Mezopotamya - zanîna mîtolojî û jiyana berî hezarên salan di navbera çemên - Dîcle û Firatê de, bêgûman destkeftinek ji bo xwendevanê kurd e. Yek ji armancên min ên herî mezin di wergerandina vê pirtukê de, ev bû.

Gava min "Mîtolojiyên Mezopotamya" werdigerandin, ji aliyekî ve ez gelekî dilşa dibûm - min didît ku Mezopotamya çi daye mirovayetiyê. Gava min mîtolojî werdigerandin, carnan hîsên min wekî pêlên oqyanusê bilind dibûn. Ev mîtolojî çend xweş hatibûn nivîsandin? Bi heyranî min dixwendinû min ew werdigerandin zimanê şêrîn ê Kurdî. Ji aliyek din ve, ez gelek xemgîn dibûm - bi hezarên ronakbîrên Kurd ên ku îro dikaribûn bi awayek herî hêja perdeya li ser dîroka Mezopotamya rabikin, tu mecalek weha bidest wan nakeve, ji bo ku dagîrkerên welatê wan dibin asteng li pêş xebatek weha. Vêca ev kirinên dagîrkeran nabin tenê zordariyek li hember mirovê Kurd, ku dîroka xaka xwe binase. Ew dibin zordariyek li hember


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tevayiya mirovatiyê, ku li ser şaristaniyek ji yên herî kevn a cîhana me bibin xwedî zanistiyek fereh.

Berî ku ez destpêbikim mîtolojiyên di nav vê pirtûkê de cîh digrin ez wergerînim, min pêşgotina Edward Petîşta wergerandibû. Ew di kovara " Nûdem " hejmara yekem de hate weşandin. Piştî çapkirina wê, min ji çend xwendevanên kovarê namê girtin. Çend hevalan ji bo vê wergerê spasiyên xwe nîşan kiribûn. Hevalekî jî, bê ku navê xwe binivîse, nameyek anonîm ji min re şiyand. Di wir de, wî hevalî ji bo wergerandinê çend pêşniyarên xwe nivîsandibûn. Ez spasiya wan hemûyan dikim.

**Cemal BATUN**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MİTOLOJIYA YEKEM

*a ku tê de tê gotin, ku çawa dunya ji laşê Xwedayekê hatiye çêkirin û insan jî, ji xwîna vê Xwedayê ne*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Di dema herî herî kevn de, gava ne asîman hebûye û ne jî erd. Gava di berava çeman de ne qamîş û ne jî avayiyên ezîm û mezin hebûne - dunya bê xweda bûye û çarenûsa kesî jî ne diyarbûy bûye. Pêlên avê yên bi xwê - Tîamat û pêlên avê yên şêrîn - Apsu, bi hev ve bûne yek û pêlên wan ketine nav hev. Wê gavê di avan de xwedayên ciwan, xweşik û dilxweş zîn bûne.

Ewan di şahiyek mezin de gihane hev. Qêrîn û dengên stranên wan ji dunyayê ve gihaye tevayiya stêrkên di asîman de, yên ku berê bêdeng bûye. Qêrînên wan perdeya dunyayê hejandiye û hevqasî bi kurayiyê ve çûye, ku Xwedayê avên şêrîn Apsu dengên wan bibîhîze.

- Na, ez nikarim bi aramî li qêrînên xwedayên xort guhdarî bikim - Apsu ji jina xwe Tîamat re gotiye - ez ne şev û ne roj rehetiyê dibînim. Ez nikarim xwe dirêj bikim û çavên xwe bimijînim. Tevayiya dunyayê bi deng û stranên wan diheje. Bese ! Ez ê wan winda


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bikim û wan ji ser rûyê erdê paqij bikim.


- Na Apsu nabe. Tiştekî ku me daye, çawa em ê winda bikin - Tîamat bersiva Apsu da ye - Her çend Xwedayên xort ne wekî em dixwazin in jî bin, divê em bi sebr û arambin.

Apsu di destpêkê de dudilî bûye. Lê, dîsa jî acizbûn û qehrê, dilê wî bernedaye û di serê xwe de plana ku wê çawa xwedayên xort bikuje û winda bike çêkiriye.

Ev plan a ku Apsu ji bo kûştina wan daye pêşya xwe, digihije gûhên Xwedayên xort jî ,yên ku kêf û eşqa xwe didomînin. Vê nûçeya reş ewan bêdeng kiriye. Wan dengê xwe birandiye û raman kirine ku çawa xwe ji xezba Apsu rizgar bikin. Di demek wusa zexmet de, li ber wan Xwedayê bi hêz û zana Êya xuya bûye û dest pê kiriye ku dilên wan xweş bike û tirsa wan vemrîne.

Piştî ku Xwedayên xort kula dilê xwe bi xemgînî ji Êya re vekirine , wî jî baş guhdarî li wan kiriye. Weha Êya nifirek mezin kiriye - bûye bayê xewê û ketiye nav kûrayiya avê. Ba derdora Apsu girtiye û hêdî hêdî bayê xewê çavên Apsu dane miçkirin û Apsu xwe dirêj kiriye û bi xew ve çûye. Bi raketina wî re, Xwedayê bihêz, zana û xort Êya xwe berdaye şikefta ku Apsu raketiye. Tac a bişewq ji serê Apsu derxistiye û ew kûştiye. Êya bi xwe, li cîhê Apsu xwe bicîh kiriye û destgirtiye xwe Damkîna jî aniye vê derê. Li vir, di cîhên wan ê jiyanê yê nû de ji Êya û Damkîna re Xwedayê herî bihêz ji nav hemû Xwedayên Mezopotamya'yê, zîn bûye. Hêztirin Xwedayê Mezopotamya'yê - Lawê Damkîna û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Êya - hêza dê û bavê xwe bihevre di laşê xwe de kiriye yek.

Navê Xwedayê nû zîndayî kirine Marduk. Ew, wekî roja bûharê xweşik bûye, xweşikbûna xwe jî li tevayê dunyayê û tebîatê belav kiriye. Hêza wî li ser a tarî û mirinê bûye. Gava bavê wî - Êya, li perçeyê laşê xwe Marduk meyze kiriye, dilê wî bi şahîyê hatiye dagirtin. Bi kurê xwe serbilind bûye. Çar guhên Marduk hebûne yên ku hemûyan jî karîbûye guhdarî bikin.Çar çavên Marduk hebûne yên ku her tişt dîtin e. Gava devê xwe lebitandiye, ji devê wî agir bariye. Deh Xweda bihev re wekî wî ne xwedî hêz û zanabûn bûn e. Ew Xwedayê herî binav, herî bihêz û herî zana bûye.

Hêz û navdariya Marduk, gelek Xwedayan eciz kiriye. Wan Tîamat peyda kiriye û dest pê kirin e, ku wê li hember Marduk bikar bînin.

- Ma te jibîr kir ku kê mêrê te kûşt ? - gotinê û di serê wê de daxwaza heyfê bicîh kirin e - Bavê Marduk, Apsu mêrê te kuşt. Her çend Marduk xorte jî, ew bi ser me dikeve û dixwazê desthilatiyê bigre destê xwe. Li hember wî şer bike û wî winda bike !

Ev peyv ketine serê Tîamat û wê dest pê kiriye, ku bifikire ku çawa Marduk winda bike.

Wê ji cin û heywanên herî bihêz artêşek pêk aniye. Di destpêkê de marên bi diranên tuj, ên ku rayên wan ji cîhê xwînê ve, bi jehrê ve dagirtiye dane hevdû. Wan tirsek weha belavî derdora xwe kirine ku yên li wan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

meyze kirine, ji tirsan di cîhê xwe de mirin e. Kûçikên har, tûpişk, masiyên wehş û gelek din berhev kirine. Yanzdeh şiklên leşkerên wehş pêk anîn e. Paşî jî, ji Xwedayên li dij Marduk, Kînguh hilbijartiye. Ew, wekî mêrê xwe qebûl kiriye û ew bûye serokê leşkerên Tîamat. Artêşa Tîamat bi her awayî diviyabûye, ku bi ya Kînguh bike. Gava wî fermanek da ye, yekcar ew fermana wî hatiye cîh û her tişt jî, wekî ku wî xwestiye bûye.

Êya, yê zana û jîr ev kirinên li dij kurê wî û wî bi xwe, bihîstine. Ew jî bi rê ketiye ku alîkarî û piştgiriyê ji Xwedayên hevalê xwe bixwaze. Gelekan ji wan diyar kiriye ku amade ne bi Êya re, şerê dijminên wî bikin. Lê nizanîbûne ku Tîamat çi tişt hemberê wan hazirkiriye. Gava amadebûnên Tîamat bihîstine, yekcar dev ji hevaltî û piştgiriya Êya berdan e.

Weha hevalên Êya bi nedilxwazî kombûne û bêdengî parastine, ji ber ku kes ji wan nizanîbûye dê çi bike û kesek ji wan jî nexwestiye bikeve şerekî newekhev de. Piştî bêdengiyek dirêj, di dawî de yek ji wan rabûye û di vê bêdengiya kur de, navê Marduk aniye ser zimanê xwe. Li gor gotinên wî " Tenê Marduk karîbûye di şerekî bi Tîamat re biserkeve û serfiraz be ".

Tirs ji dilên xwedayên kombûyî derketiye. Hemû li gel hev çûne odeya pîrozbahiyê. Nan xwarine, şerab û bîra vexwarine û şêwir li hev kirin e, şerabê jî her ew kêyfxweş kirin e. Wan ji Marduk re kursiyê mîrîtiyê çêkirine û daxwaz kirine da ew li ser wî kursî danişê, pesn û methê Marduk dane, diyarkirine ku di rojên xweş û xerab de, dê li gel bin û gotin e :



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Tu Xwedaya herî hêja, herî bihêz û herî xwedî pesindanî ; tu çi fermanê bidê divê bê bicîhkirin. Xweza tu caran çekên te armanca xwe şaş nekin, xweza dijminên te her li ber te bêhêz bikevin û tu biserkevê. Tu fermanê dide - divê her tişt li ber te bê, tiştê ku tu bibêje - bimrê, divê bimrê! Tiştê tu dixwazê - divê yekrast pêk werê û tu çi dixwazê - tu di wê hêzê de yî ku tu pêk bînê!

Û Xwedayan cilên herî xweşik anî ne, ew danîne ber Marduk. Xwestine ku ew wan winda bike û dawî dîsa weha bike ku ew ji nu ve peyda bibin, bi vî awahî hêza xwe ya xwedayî nîşan bide.

Marduk ferman daye û ji cilan tiştek li holê nemaye û winda bûn e. Fermanek nu daye û vê carê cil carek dî xuya bûn e.

Bi dilxweşî û serbilindiyekê Xwedayan li Marduk temaşe kiriye û pesnên xwe anîne zimên :

- Her bijî Mîr Marduk. Her bijî Mîrê me !

- Ya Xwedayê xurt û zana, Ya Xwedayê herî bihêz Marduk - gotine - here û jiyana Tîamat biqedîne. Bere ba û bahoz xwîna wê li gel xwe bibin ber çolên ziwa û dur !

Marduk ji destên Xwedayan çekên giran wergirtiye. Wî kevana xwe amade kiriye û tîrên xwe xistine torbeya bi qarîşa xwe ve. Kopalê xwe girtiye û ferman daye ba û bahozên her çar aliyan ku bidin duv wî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Li erebe ya şer * a bahozê siwar bûye, ya ku tirs li derdora xwe belav kiriye. Li pêşya erebê jî çar hespên dijwar bicîh kirin e, da wê bikşênin. Ew hesp : Mirin, Zilm, Ahîret û Edr bûn e. Brûsk û agir di laşê Marduk de xwe kirine yek û wî daye rê. Ber bi şer ve bilez û bi çavsorî, bi daxwaza ku dijmina xwe yekcar winda bike çûye. Wusa wekî agir û lezê, daye ser Tîamat.

Tîamat, gava Marduk weha dî ye, yekrast leriziye. Lê, gava wî Xweda Tîamat û artêşa wê dî ye, vê carê Marduk jî leriziye,. Qêrîna yekem Tîamat da ye. Kîn û nefret di qêrîna wê de hebûye û nifra herî mezin li dij Marduk xwendiye. Artêşa wê dest avêtiye çek!

Marduk werîsê xwe avêtiye û Tîamat dîl kiriye. Tîamat devê xwe fereh vekiriye û bi hemû hêza xwe qêrînek da ye. Marduk ferman daye bahozan, da ji devê Tîamat ve bikevin laşê wê û dilê wê biqelşînin. Ji heybeta Marduk, Tîamat deng qut kiriye û bêdeng maye Marduk kevanê xwe amade kiriye, tîrên wê kişandiye û ber bi laşê Tîamat ve berdaye. Tîr ji her dû aliyên laşê Tîamat ve derbasbûye. Marduk, Tîamat kuştiye ! Bi xencera xwe, rayên wê vekirine û ferman daye bayê bakûr ku xwîna Tîamat ber bi çolên ziwa û dur ve bibin.

---

* *Erebe yên dema kevnare, yên ku gladyatoran di şerê hemberê hev de ajotiye. Yên ku du, çar, şeş an heşt... hespên bilez kişandin e. Bi taybetî di dema Imparatoriya Roma de, ev erebên şer ji alî gladyatoran ve dihatin bikar anîn. Diyare berî wê, ev erebe li Mezopotamya hatine nasîn.*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Artêşa Tîamat gava kuştina xwedaya xwe dî ne, ji tirsa hemû reviyan e. Hevalên Tîamat jî daxwaza wan ku şerê Marduk bikin nema ye. Xwestine tenê jiyana xwe biparêzin. Lê, Marduk qîma xwe ne aniye û hemû wekî dîl girtine. Çekên wan ji wan standiye û hemû şkandine. Tevayiya leşkerên Tîamat li qeydê xistine û girêdaye, di dawî de jî mêrê Tîamat û serokartêşê dijminan Kîngu wekî dîl girtiye . Hemû nîşanên desthilatiyê jêkirine û ferman daye ku girêdayî û li qeydan xistî wî bavêjin hucreyek tarî.

Dîsa hatiye ser laşê Tîamat a mirî. Bi şûrê xwe ew kiriye du qet. Qetek bilind kiriye û jê asîman avakiriye û mifte lê xistine, da ava asîmanan rawestêne û parêzger jî danîne ber. Ji qetê din ê laşê Tîamat erd çêkiriye. Ji xwedayên bilind re qesr avakirine û ji her yek ji wan re cîhek daye diyarkirin. Li Rojhilat û Rojava - ji rojê re derî çêkirine yên ku hatine kilîtkirin. Di navînê de jî asîman bicîh kiriye. Yekem stêrk çêkirine, paşî jî heyv - beriqandin diyarî heyvê kiriye û çêkirina tariyê jî daye heyvê ku pê rabê. Gotiye heyvê kengî bi tevayiya xwe ve derkeve, kengî rûyê xwe dirêj an girover nîşan bike û kengî xwe veşêre. Bi vî awayî dem ji hevûdu dane veqetandin.

Piştî ev hemû tişt avakirine û çêkiriye, bangî Xweda Êya kiriye û jê re gotiye :

- Ez dixwazim ez hestû û çerm çêbikim û xwînê di rayan de kombikim. Ez dixwazim jiyanê bidimê û navê mirov lê bikim. Ji bo vê jî ezê xwedayên dijmin bidim qelandin û ji wan ezê mirovan pêkbînim.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Êya baş raman kiriye û weha bersîva Marduk da ye :

- Tu tenê xwedayekî ji bo vê armancê bikujê, bese. Bêhêle bere yên din bimînin.

Marduk bangî hemû Xwedayan kiriye, herweha ferman da ye ku xwedayên dijminên wî jî bînin. Berê xwe da ye wan, xwestiye ku ji bo mirov pêkbînê û ji xwedêbûnê wî bixê yekî hilbijêrin. Xwedayan hemûyan bi yekdengî bang kiriye :

- Bere Kîngu bibe qurban ! Hemu xerabî ji mêjiyê wî derdikevin. Herweha Kîngu bû yê ku li hember te serdariya leşkeran dikir.

Kîngu anîne ber Marduk. Marduk jî rayên Kîngu qelaştine û ji xwîna wî mirov pêkanî ye.

Weha cîhan, asîman û erd hatiye damezrandin. Dawiya wê jî mirov hatiye çêkirin - ji bo ku li ber Xwedayan serî deyne û gûhdariya emr û fermanên wan bike.

Fîlosof û pîrên Babîlonê avakirina erd, asîman, cîhan û mirovan, weha rave û eşkere kirin e.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MİTOLOJIYA DUWEM

*a ku tê de tê gotin, ku çawa Xwedaya Mezopotamya İştar peyayî cîhana din bûye*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Di dema gelek gelek kevn de, Xwedayê rêzanan Tamuz, bi evînek kur û daxwaziyek mezin bi rê ketiye da Xwedaya evînê İştar ji xwe re bixwazê. Carnan ji rêyên bi dirî û carnan jî, ji rêyên kesk û hêşîn derbasbûye. Dewarên pezan, beran, çêlek, ga, kehrik û gamêşan di rêya wî de hebûn e. Gava wan Tamuz dîtiye û rêya wî ji ber wan ve derbasbûye, da bighê armanca xwe, hemû rawestane, da ku rêza xwe jê re nîşan bidin. Tamuz ji cîhana xwe ya hêşîn derketiye û ji destên wî şîr û qeymak herikîn e.

Brayê İştar dîtiye bê çawa Tamuz ber bi wan ve tê, herweha dayika İştar jî ew dîtiye bê çawa nêzîk dibe. Bra û dayika İştar bangî kirin e û destpêkirine da şîretan bidine xwedaya evînê.

- Va ye Tamuz tê. Wî wekî zavayekî xwe girêdaye.. Qismetê xwe winda neke İştar. Pê re bizewice. Ger tu bibe jina Tamuz dê tu kêmanî yên te çênebin. Hûn ê bi hevdu re şîr vexin, qeymak bixwin, di şevên sar û tarî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

de , hûn ê bi hiriya germ xwe bipêçin û germbibin.

İştar jî piştî ku guhdariya bra û dayika xwe kiriye, serê xwe şiştiye û bêhnên xweş li xwe dan e. Cilên xwe yên herî spehî li xwe kirine. Zêr û zîv û elmasên xwe bi xwe ve kirine û derketiye da bixêrhatina Tamuz bike. İştar, wekî ku dê û brayê wê jî xwestine, bi bersîvekî erêyîn daxwaza Tamuz aniye cîh. Tamuz jî İştar himêz kiriye û ew biriye mîrîtiya xwe.

Tamuz nizanîbûye bê İştar çiqas gelekî ji xwe hizdike. Jiyana rehet, bêkêmanî û bêqelebalix, piştî demekê bi İştar nexweş hatiye. Wê daxwaza ferehkirina mîritiya xwe kiriye û xwestiye hêza xwe gelek gelek zêdetir bike. Xwestiye fermanên wê li ser heremên xwedayên din jî derbas bibin.

Di tarîtiya binerdî û ya mirinê de, fermanên xwişka mezin a İştar, Xweda Ereşkigal derbas bûn e. Binerd - herêma wê bûye û kes newêrabûye xwe nêzîkê van cîh an bike.

Rojekê İştar cilên xwe yên cêjnî li xwe kirin e. Tac a xwe ya xwedatiyê daye serê xwe. Mucewharatên xwe yên giranbiha bi xwe ve kirin e, dev ji Tamuz berda ye û ji heremên mîrîtiya wî derketiye. Rêya xwe daye cîhana din a binerdî û çûye ba xwişka xwe Ereşkigal. Du armancên İştar hebûne ; Ya yekem terkkirina Tamuz bû ye û ya duwem jî di bin sîha vê de dîtina cîhana binerdî bû ye, ya ku wê gelek xwestiye da bikeve nav sînorên mîrîtiya wê. Berî ku bi rê kev e, wê şîret ji şîretvanê xwe yê herî bilind xwestiye :

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Ger heta sê roj û sê şevan ez venegerim, bizanibe tiştek gelek xerab hatiye serê min. Wê gavê bilez biçe Qesra Mezin ya Xwedayan. Bigrî, qêrînan bide, li xwe bixe! Daxwaz û hêviyên alîkariyê ji xwedayan bixwaze.

Dawî xwe bi awayek pêwîst amade kiriye û ketiye rêya ku xwe berdide cîhana binerdî û vegera wê nîne. Bûye rêvînga cîhana - ku tarîtî, toz, şilî, ax a reş û hişkayî desthilatiyê lê dikin.

Li ber deriyê cîhana binerd rawestaye , bang û qêrîn da ye :

- Derîvano, zû derî veke ! Zû veke da ez derbasî hinduru bibim.

- Tu kî yî ? Derîvan pirs kiriye û ji qula derî ve temaşe kiriye.

- Ez im. İştar - Xwedaya ezmanan. Ji cîhê ku roj tîrêjên xwe berdide û ronahiyê belav dike.

- Ger tu Xweda İştar bê, ji cîhê ku roj derdiçê û ronahiyê belav dike - çima tu dixwazî peyayî cîhana binerd a tarîtiyê bibê - ji cîhê ku hatin heye û veger nîne.

- Derî veke ! Zû derî veke ! - gotiye İştar. Ez hatime da slavekê li xwişka xwe Ereşkigal bikim, seredanekê bidimê. Ger tu zû derî ji min re venekê, ez ê derî bişkînim. Ez ê kîlîtê perçe bikim û ez ê hemû miriyan derbasî cîhana sererd bikim û ew dê ji tiştên dijin zêdetir bibin, dê desthilata mirîbûnê li ser a jiyanê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

pêkbînin.

Derîvan gelek tirsiya ye:

- Ez hêvî dikim, hinekî raweste. Xwedaya bihez ez ji te tika dikim, tenê hinekî. Divê ez ji xwediya xwe û xwişka te - Xwedaya Ereşkigal bipirsim. Bê fermana wê ez newêrim û nikarim bi xwe biryarê bidim.

Derîvan bilez ber bi Xwedaya xwe Ereşkigal ve bazda ye, da biryara derîvekirinê ji wê bigre :

- Xwedaya min, li ber derî xwişka te Xweda İştar rawesta ye û fermanê dide min da ez ji wê re derî vekim. Dixwaze derbasî cîhana binerd bibe û werê da seredanê bide te.

Ji qehr û eczbûna xwe Ereşkigal tiliya xwe gez kiriye. Qet ji bo xwişka xwe İştar, hizkirin çiye, di dilê wê de nebûye. İştar - karîbûye ronahiye belav bike, evîn û dilxweşî bide gel . Vê rastiyê hiştibûye dilê Ereşkigal beramberî İştar, tijî nefret û çavnebarî bibe. Nerîna Ereşkigal, nerîna mirinbelavkirinê bûye, wê karîbûye tenê qehr û girî belav bike.

- Derî ji wê re veke, bere werê - bi hêrs û ecz gotiye - Herweha li gel wê bi awayekî weha bide û bistîne, hew çawa qanunên cîhana binerdî derbas dibin !

Derîvan derî vekiriye û İştar derbasî cîhana ku di bin mîrîtiya Ereşkigal de ye bûye. Heta bigihije cem Ereşkigal, pêwîst bûye ku ji heft deriyan ve derbas bibe.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Li ber deriyê yekem, derîvan taca serê İştar ji serê wê aniye xwar.

- Ev çiye ? Ev tê çi manê ? İştar, bi hêrs pirsiye .

- Ev qanunên cîhana binerdî ne - Derîvan bersîva wê da ye . Yê ku derbasî cîhana me dibe, divê xwe ji hemû tiştên xwe yên berê mehrum bike.

Gihiştine ber deriyê duwem û derîvan kopalê ezmanan ji destê İştar aniye der. Li ber deriyê sêyem medalyona wê ya şînê vekirî ji stuyê wê derxistiye. Gihiştine deriyê çarem, li wir jî dewlemendiyên ku bi xwe ve kirine, derîvan ji İştar standin e. Li ber deriyê pêncem bazinê wê ji destê wê kiriye. Gava deriyê şeşem jî derbaskirine û gihiştine deriyê heftan, tutişt li ber İştar nebûye - ne cilên cejnî, ne kopalê mîrîtiya wê ya ezmanan, ne taca wê ya Xwedatiyê, ne zêr, zîv û elmas... Her çawa ku mirov hatiye dinyayê, bi vî awayî derketiye pêşya xwişka xwe, Xwedaya cîhana binerd - Ereşkigal.

Rûniştî li ser kursiyê bilind, mîra cîhana binerdî li xwişka xwe bi hêrs û çavekî biçûk temaşe kiriye. Herweha yekcar ferman da ye kolên xwe, da wê bigrin.

- Wê bibin qesra min ! Li wir jî, wê bavêjin zindana herî tarî. Şest nexweşiyan berdin ber. Bere xwe bavêjin ser - ji çav heta lingên wê bixin ezb û işkencan. Bere nexweşiyê belavî tevayiya laşê wê bikin. Wekî şêrên birçî, bere ji laşên wê yên melul xwînê bimijin.

Koleyan İştar birine qesra Ereşkigal. Ew berdana zin-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dana herî tarî û şêst nexweşiyên cuda cuda avêtine ber. Wan jî xwe berdane laşê wê - mirin hêdî hêdî li tevayiya laşê Îştar belav kirin e.

Bi derbasbûna Îştar a cîhana binerdî û windabûna wê ji ser rûyê erdê ve û nexasim bi mirina wê re, jiyana cîhanê her wekî rawestaye. Daran pelên xwe hilweşandine, gulan xwe tazî kirin e, mêw û hêşînahî hew gihan e. Li ser rûye erdê ne evîn, ne kêfxweşî, ne ken û ne hêvî man e.

Şîretvanê Îştar ê sereke, cilên feqîr û hejaran li xwe kiriye. Bi rundikan di çavan û qêrîn û gaziyan di dev de xwe gihandiye Qesra Xwedayan. Ji bo ku merhamet, alîkarî û hêviyan ji Xwêdêyan bidest bixe, ji bo xwedî û Xwedaya xwe - Îştar.

Li ber Xweda Eya rawesta ye û hêstiran ji çav xwe berda ye :

- Xwedayê zana û mezin, nehêle keça te ya delal, xwedaya ezmanan û dilgeşiyê, evîn û ciwaniyê di cîhana binerd de bête windakirin. Nehêle ku kopalê mîritiya ezmanan biqelşînin. Nehêle kevirên buhagiran bizîvirînin çaqilê reş.

Eya guhdariya şîretvan kiriye. Ji bin neynoka xwe hinek herî derxistiye û ji wê du tişt çêkirine, yên ku jibehane mirovan. Xwarina jiyanê daye yekî û av a jiyanê daye yê din. Bi diyariyên sehrî, ev her du berhemên xwe rêkirine cîhana binerd. Fermanên xwe daye wan û xwestiye ku keça wî ya delal û xwedaya ez-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

manan İştar bînin.

Bê guman bi dîtina wan ve Ereşkigal naskiriye, ku bavê Xwedayan - Xweda Eya , ev her du " kes " rekirine gel wê. Bi rêz û germî Ereşkigal silava xwe ya bixêrhatinê li wan kiriye. Av a cemidî pêşkeşî wan kiriye, lê wan qebul nekiriye. Nan pêşkeşî wan kiriye, dîsa bersîva nexwestinê ji wan girtiye.

- Baş e, hun çi dixwazin ? Ereşkigal ji wan pirsiye .

- Xwêdaya ku te, di qesra xwe de avêtiyê zindanê û şêst nexweşiyên cuda, te berdane laşê wê, bide me.

Ew hêza Ereşkigal nebûye, ku daxwaza Xwedayê xwedayan Eya paşve vegerîne, bi dervî dilxwaziya xwe, xwestina wan qebul kiriye. Bi vî awayî ewan çûne qesra Ereşkigal.

Qasidên Eya, gava ketine qesra Ereşkigal xwestine yekcar herin zindana, ku İştar tê de ye. Ketine hundirê zindanê û İştar li erdê dirêjkirî, bêlebt dîtin e. Ew mirî bûye. Wê gavê qasidê yekem ber bi İştar a mirî ve çûye û xwarina jiyanê, ya ku Eya daibûyê berdaye devê İştar. Qasidê duwem jî rûyê İştar bi av a jiyanê şil kiriye. İştar yekcar çavên xwe vekirine. Bayê jiyanê dîsa kezeba wê dagirtiye. İştar da ye ber xwe û rabûye ser piyan.

- Tu azad î - Qasidên Eya gotinê - Tu dikare ji cîhana binerdî derkevê.

Bi derketina wê ji qesra Ereşkigal ve, şîretvan û rûspî

 Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

yên cîhana binerd dora wê girtin e.

- İştar - gotin e - tu dixwazê ji cîhana ku kes jê venegeriya ye, vegerê. Tu ketî nav hejmara miriyan û yek ji wan tê hesabkirin. Bi vî awayî niha tê kêmaniyê bixê nav qanunên cîhana me. Ji ber vê yekê divê ji bo cîhê xwe tu yekî din rêbikê. Gava rohnayiya cîhana sererd da çavên te, tu - İştar, yekî ji me re rêbike, yê ku cîhê te dagre.

İştar soz û peyman daye wan, ku yekî din ji bo cîhê xwe rêbikê. Bi vî awayî wan jî, ji derdora İştar xwe dan e aliyekî.

Ji her heft deriyan carek din derbas bûn e û li ber her deriyekî derîvan tiştên İştar lê vegerandin e. Di dawiya dawî de, ji deriyê heftan gava derketiye, dîsa di serê wê de tac a Xwedatiya ezmanan hebûye. Cilên cêjnî dîsa li wê bûn e. Zêr, zîv û elmasên xwe jî li xwe kirin e. Li pişt derî tîrêjên rojê bixêrhatin li İştar kirin e û evîn, dilgeşî û ken jî, dîsa di rûyê erdê de peydabûn e.

Herweha bi wê re çend nunerên cîhana binerdî jî hatine. Da yekî ku dê cîhê İştar di cîhana wan de bigre bibin cîhana binerd. Her li pey İştar bûn e, da demek berî demekê ew soza xwe bicîh bîn e.

Di rêya xwe de gihiştine bajarê yekem. Xwedayê vî bajarî derketiye pêşya wan, bi germî û rêz bi kabokan ve xwe daye erdê û bixêrhatina Xwedaya İştar kiriye. İştar rexma xwe li wî belavkiriye. Evîn û kêfxweşî jî diyarî bajêr kiriye. Li bajarê duwem jî, her weha dubare

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bûye.

Xwedayê cîhê sêyem ku gihiştinê de, mêrê İştar Tamuz bûye. Ew li ser kursiyê xwe runiştî, li hêviya İştar bûye. Ji bo bixêrhatinê jî, ne çûye pêşya wê.

Xweda İştar a ku ji xwe gelek hezkiriye, li ser vê helwêsta Tamuz bi ber xwe ketiye û hêrs bûye. İştar nikarîbûye qebul bike ku ji cîhana binerd vedigere û mêrê wê bi xwe bi vî awayî wê qebul dike. Pê hisaye ku desthilatdariya wê, bi vî awayî dikeve xeterê. Berê xwe daye nunerên cîhana binerd û Tamuz îşaretî wan kiriye. Wan jî yekcar xwe avêtine ser Tamuz. Tevayiya nexweşiyên di destên wan de hene, li laşê Tamuz belav kirin e.

Tamuz hawar û gaziya xwe xwestiye bighîne Xwedayan. Qêrîn dan e, bang kiriye, lê dengê wî negihiştiye guhên wan. Xwehezkirina Tamuz li ber a İştar bêhêz ma ye. Ew birine cîhana binerd û wî cîhê İştar dagirtiye.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MİTOLOJIYA SÊYEM

***a ku tê de tê gotin, bê çawa mîrê bajarê Kîş ê Mezopotamî - Etana, bilindî ezmanan bûye.***

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Qartel û marê reş biryara xwe didin ku bibin destûbrakê hev. Li ber erdê û Xwedayê Rojê Şamaş jî sûnd xwarine, da kes ji wan îxaneta yê din nekê.

Weha Qartel bi bilindayiya çiyê ve firiye û marê reş jî bi çiyê ve hilkeşiya ye.

Gava qartel carekê kerek girtiye, bangî marê reş jî kiriye. Marê reş jî tevlî marçêlîkên xwe ve û qartel bi hev re ker xwarine. Gava ku marê bi xezalekê ve daye, wê jî bangî qartel kiriye û qartelê jî bi çêlîkên xwe ve xezal xwarine. Weha wekî du bira, wan tiştên bidest xistine li hevdû behr kirine û navbera wan her çûye baştir û baştir bûye.

Çêlîkên qartel mezin û bihêz bûne. Bi mezinbûna wan ve, ramanên xerab destpêkirine bikevin serê qartelê mezin. Ev ramanên xerab di serê wî de baş cîhê xwe girtine û wî destpêkiriye wan vekirî ji çêlîkên xwe


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

re jî bibêjê :

- Ez ê bilind, bilind bi ezmanan ve bifirim û paşî ezê wekî bruskê xwe ber bi erdê ve berdim. Wekî tîrê ezê hêlîna marê reş, qul û wêran bikim. Ezê di demeke weha de vî tiştî bikim, gava ku marê reş derketiye nêçîrê û di hêlînê de tenê çêlîkên wê mabin. Ezê çêlîkên wê têra xwe bixwim.

Di nav qartelên ciwan de, yê herî biaqil berê xwe daye bavê xwe û ji wî re gotiye ku dê xezaba xwedayê rojê Şamaş bikşînê ser xwe.

Lê, dîsa jî qartel bi ya zaroyê xwe yê biaqil nekiriye û avêtiye ser hêlîna marê reş. Hemû çêlîkên marê reş xwarine, hêlîn wêran kiriye û carek din ber bi ezmanan ve firiye.

Marê reş jî, ji nêçîra xwe vegeriya ye. Gava gihiştiye hêlîna xwe, bawerî bi çavên xwe ne aniye. Hêlîna wî hatibûye wêrankirin, çêlîkên wî windakirin. Mala wî xerabûye, hêstiran ji çavên wî xwe berdan e... Lê, wî famkiriye ku kî ye - yê mala wî xerabkirî û çêlîkên wî xwarî...

Dilê marê dagirtî bi xezebê, xwe daye rê û çûye ber Xweda Şamaş. Li ber wî gazindên xwe kirin e û giliyê qartel kiriye.

- Qartel hevaltiya me xerakir. Hêlîna min hilweşandiye û çêlîkên min xwarine - heta ez li nêçîrê bûm, wî jiyan li ber min reş kiriye - ez hêvî dikim,


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

xezaba xwe li wî bîn e. Xerabiyên herî mezin bîne serê wî, çawa wî mal li min xerakir, a wî wêrantir bike. Erd û ezman her du di nav lapên te de ne, rê nede qartel da birevê.

Gava guhdariya marê reş kiriye, dilê Şamaş bi xwe êşiya ye. Berê xwe daye mar û jê re gotiye :

- Tu dikarê herê, xemê nexwe ! Ezê gamêşekî mirî rêkim rêya te. Zikê gamêş veke û xwe tê de veşêre. Dê çûk û teyr destpêbikin xwe bavêjin ser gamêşê mirî. Di nav wan de, dê qartel jî werê da ji laşê gamêş behra xwe bigre û bixwê. Gava wî niklên xwe avêtin zikê gamêş, tu jî pê ve bide - baskên wî bişkîne, xeyfa xwe ji wî bigre û wî bavêje meydana ku nêçîrvan agir dibarînin ser nêçîrên xwe.

Her çawa Şamaş gotiye, marê reş jî weha kiriye. Di rêya xwe de leqay gamêşek mirî hatiye, zikê gamêş qelaştiye û tê de xwe veşartiye. Ji hemû deran çûk û teyr xwe avêtine ser laşê gamêş. Laşê gamêşek weha mezin, bêgûman ji bo xwarina çûkan û teyran dewlemendiyek mezin bûye, têra xwe jê xwarine. Qartel jî bêhna goştê gamêş kiriye û ji qartelên xwe yên ciwan re gotiye :

- Nêzîkî vê derê bêhna goştê gamêşê tê. De zû em bi wir ve bifirin û têra xwe bixwin.

Qartelê ciwan ê herî biaqil li bavê xwe zîviriye :

- Ya herî baş ew e, ku em bi aliyek din de bifirin. Ger marê reş xwe di zikê gamêş de veşartibe û li hêvya te

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bê, tê çi bikî ?

Qartelê mezin gûh nedaye gotinên qartelê xwe yë jîr. Bilind, bilind firiye û xwe berdaye bi jêr ve, neynokên xwe ji laşê gamêş ve derbaskirine. Hinekî weha rawestiyaye, gava tiştek bi serê wî nehatiye, zikê gamêş qelaştiye. Wê çaxê marê reş xwe avêtiyê û pê ve da ye. Baskên wî şikenandine û zimanê xwe derxistiye ber bi çavên qartel ve.

- Ez hêviyê ji te dikim, li min bibûre, min efû bike - qartel gotiye - tu çi bixwazê, ezê ji te re pêkbînim.

- Ji bo çi ez li te bibûrim û te efû bikim - marê reş qêrîn da ye - jehra xwe berdaye laşê qartel û hestuyên wî şikenandine. Lê, dîsa jî derbeya dawî li qartel nexistiye. Ew avêtiye meydana nêçîrvanan, ên ku agir bi ser nêçîrên xwe ve dibarînin.

Di vê demê bi xwe de mîrê bajarê Kîş - Etana, hatiye ku qurbanekî pêşkeşî xwedayan bike. Di nav mij a muqades a ku bêhnên herî xweş jê tên, di bilindayiya ezmanan de, hatiye da tika ( rîca ) ya pîreka xwe bighîne xwedayan, da bibin xwedî zarok.

Etana bi hêvî û duayan li ber Xweda Şamaş xwe berdaye ser kabokên xwe :

- Ya Xwedayê mezin, xwediyê me Şamaş, nebatekê bide min, da daxwaza me bicîh were. Rêya nebatê nîşanî min bike, ji bo ku di mala min de fêkiya malbatê - zarok peyda bibe.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Şamaş li daxwaza Etana guhdarî kiriye û bersîva wî weha daye :

- Rehet bibe, gumanê nexwe. Bi rêya xwe ve biçe. Tê leqay meydanekê werê, ew meydana nêçîrvanan e. Ew nêçîra di meydanê de ye, bibîne. Ew dikare alîkariya te bike.

Etana bi rêya xwe ve çûye, gihiştiye meydana nêçîrvanan a ku nêçîr tên agirbarandin. Di meydanê de qartel dirêjkirî bûye û li hêvya mirina xwe bûye. Gava Etana ew dîtiye, nizanîbûye ku dê qartel çawa alîkariya wî bike. Etana dîsa jî xwe berdaye meydanê, birînên qartel dermankirine, xwarin û vexwarin da yê û ber bi serê qartel ma ye, da bibînê - dê çi çêbibe.

Roj li pey rojan qartel hêza xwe ya berê girtiye. Birînên wî ber bi rehetbûnê ve çûne. Lê dîsa jî Etana nizanîbûye dê çawa qartel alîkariya daxwaza wî bike û bi vî awayî, dê bibe xwedî zarok.

Şevekê Etana xewnek ecêb dîtiye. Di xewna xwe de dîtiye ku bilindî ezmanan dibe. Li ser kursiyê ku şêr di bin de dirêjkirîne, Xwedêya evînê İştar bi xwe rûniştî bûye. Ezmanên ku İştar xwediyê wan jî bûye, li derdora İştar şînayiya xwe ya ciwan û xweşik belavkiribûn e. Di nav vê şînayiyê de, çavê Etana li nebata ku dixwazê û muqadese ketibûye. Etana di xewna xwe de gihiştiye kêfxweşiyek gelek mezin. Daxwaza wî bicîh hatibûye. Lê gava şiyar bûye û dîtiye tiştên dîtî xewn bûn e û her tişt li derdora wî wekî berê bûye, kêfxweşiya wî yekcar wenda bûye.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Tu çima weha bi keder î ? Qartel ji wî pirsiye.

- Nuha ez dizanim li kudê, ezê nebata ji min re pêwîst peyda bikim, da daxwaza min û jina min bicîh bê - Etana lê vegerandiye - lê ez nizanim çawa ez bigihijim wê. Ji ber vê yekê jî di mala min de, ne zarok dê ji me re çêbibe, ne jî kêfxweşî dê bikeve mala me.

Weha Etana dest pê kiriye, da xewna xwe ji qartel re bibêje :

- Etana - qartêl gotiye - ez rêya ezmanan dinasim. Bi hezarên caran di bilindayiya ezmanan de ez firî me. Ger tu bixwazê, ezê te bigihînim bilindiya herî jor a ezmanan. Ji bo ku tu bibe xwedî nebata, ku tu xeyala wê dike. Xwe bi zikî dirêj bike, pişta xwe bide ber sînga min, ji cîhê ku baskên min derdikevin bi destên xwe, xwe baş bigre. Bi hevre emê ji erdê bilind bilind bi jor kevin.

Bi dilgeşî Etana guhdarî li peyvên qartêl kirin e. Çawa ku qartel gotiye, Etana jî weha kiriye. Gava qartel dîtiye Etana xwe baş girtiye, baskên xwe lêxistine û bi jor ve firiye. Ber bi bilindiya ezmanan ve çûye.

Bi tirs Etana li erdê temaşe kiriye. Bi ser gund û bajaran ketin e, her tişt li erdê biçûk û biçûk bûye.

- De bêje xwediyê min - qartel gotiyê - erd çawa wekî girek biçûk xuya dike û derya wekî çemekî biçûk.

Qartel baskên xwe bihêztir lêdane. Ew û Etana bi jortir ketin e.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Binêre - qartel gotiyê - xwediyê min, nuha jî derya wekî cokek avê diyar dibe.

Qartel baskên xwe dîsa lêxistine û gotiye :

- Erd jî wekî daristanek biçûk xuya dike, ne weha xwediyê min ?

Hewqas bi jor ketine ku erd wekî libek genim ber bi çavê wan biçûk bûye û derya biqasî dilopek baran biçûk ma ye. Û paşî tiştek ji wan jî nemaye... Tenê valayiya ezmanan li derdor , li bin û li jorî wan diyar bûye. Gava Etana bala xwe daye û dîtiye ku li derdora wî tenê valayî heye, tirs ketiye dilê wî.

- Raweste, tiştek li derdora me nîne, de ka em vegerin - Etana gotiye - Ez dixwazim em vegerin erda xwe.

Qartel ê ku fêrî bilindiya ezmanan bûye, bê tirs li xwediyê xwe vegeriyaye û gotiye :

- Tu çi dibêje ya xwediyê min ? Em gihiştine hema hema bilindiya herî jor a ezmanan, hinek ma ku daxwaza te ya herî mezin bicîh bibê û tu dixwazê em vegerin, çawa dibe ?

- Zû, zû vegere - Etana dûbare kiriye - Zû vegere cîh ê ku em jê hatin.

Etana ji tirsan leriziye. Xeberdanên wî jî, ji devê wî bi zorê derketin e. Ji vê tirsa mezin çavên xwe girtine û pê hisaye ku destên wî qurumî ne. Destên xwe berdan

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

e... û ji valayiya ezmanan a herî jor ve ketiye.

Qartel bi lez daye dûv ku bigihiyê, da wî xelas bike, Lê negihiştiye Etana. Kesê ku jiyan daye wî, ew bi xwe ji jiyane xwe bûye.

Erd a ku jiyan daye Etana, weha jî, jiyana wî jê paş girtiye.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MİTOLOJIYA ÇAREM

*a ku tê de, tê gotin çawa Mîrê Mezopotamya - Gilgameş li nemirîbûnê geriya ye*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org


Kî mirov naxwazê ku her bijî û nemire, da pîr nebe û her dem li ser xwe û ciwan bimîne ? Herweha Mîrê bajarê Uruk'ê li Başûrê Babîlonê - Gilgameş jî xeyala nemirîbûnê kiriye. Bi hêz û şiklê xwe Gilgameş jibehaye xwedayekî. Lê, ew tenê ji rêya diya xwe - Xwedaya Nînsun ve, bi xwedêyan ve girêday bûye. Di laşê wî de ji ber ku xwîna mirovan jî geriyaye, ew jî wekî her mirovî bi mirin bûye û gava roja wî were, ew jî rêviyê mirinê bûye. Wek tê zanîn, di mirovan de gelek caran raman û planên kur jî peyda dibin û ew bi ximês xwe didin ramanên xwe, da ew pêk bên.

Mîrê bajarê Uruk - Gilgameş, biryara xwe daye ku planek mêranî û ya ku diyarî ji dîrokê re bimîne, her dem li ser bê peyivandin, pêkbîne. Fermana xwe daye şêwirmendên xwe, ku kargehek mezin avabikin a ku tê de kevirên jidehay û hêz bidin çêkirin. Xwestiye derdora bajarê Uruk' ê bi sed ên fereh û mezin bipêçê, ku tu dijmin, ê herî xurt û bihêz jî nikaribe hilweşîne.

Paşî biryar daye û bangî hemû rûniştvanên bajarê Uruk'ê kiriye, da di çêkirina keviran de kar bikin. Mêr, jin, zarok - diviya bûye ku hemû ji bo vî karî seferber bibin. Herweha di avakirina sedê de jî karbikin. Wan bîngehê sedê kolane, kevir çêkirine, ji berbanga sibehê heta tariya şevê her avakirine û avakirine. Tenê jî mafê Gilgameş hebûye ku bibêje, kengî dikarin bêhna xwe bidin. Kesî nikarîbûye bi karekî din mijûl bibe, ji dervî avakirina sedê. Ji malbatan her yekî li cîhekî karê xwe kiriye. Gelek caran bi rojan, bav - kur nedîtiye, mêr - jin nedîtiye, dê - keç nedîtiye. Dem ji bo peyvandinê, xeberdanek di nav hevalan de, ji bo kêf û şahiyê nebûye. Avakirina sed a Uruk' ê tevayiya dem qurpandiye û her tişt ji bo vî sedî bûye. Gilgameş roj berî rojekê xwestiye sed biqede. Wî bi xwe jî, tevayiya dema xwe daye avakirina sedê. Ne bêhn û istirahatek ji bo xwe girtiye û ji xwe ev mecal qet ne daye welatiyên xwe. Gava stêrkan di esman de geş kiriye û dawiya roja xebatê ya giran hatibûye, tevayiya gel ji westanê li cîhê xwe ketin e û hema li wir bi xew ve çûn e.

Gava tîrêjên rojê destpêkirine ku rohnayiya xwe belavbikin, bi berbanga sibehê ve bi dengên deholan Gilgameş xelk ji xewna wan rakiriye û her kesî dest bi karê xwe yê ku hatiye dan, kiriye.

Sed a Uruk'ê roj bi roj bilind bûye, bi vê re jî bêhntengî û ecza gel. Gazind, gilî û nifirên xelkê sînorên tehamulê derbaskirine û gihiştine heta guhên Xwedêyan. Xwedê hemû kombûne û civiyane, da çareyekê ji rewşa xelkê re peydabikin. Lê, li ser rûyê



erdê wan nikarîbûye miroveki tenê peyda bikin, ê ku bikaribe serî li hember Gilgameş rake.

Ji ber vê yekê jî, man e ku ji nav xwe Xwedayekî hilbijêrin. Çavên hemû Xwedaya ber bi Xweda Aruru ve zîviriye :

- Tenê tu dikarê alîkariya rûniştvanên Uruk bike - gotine Xweda Aruru. Mirovekî çêbike, ê ku biqasî Gilgameş bihêz û mêrxas be. Emê wî rêbikin dinyayê, da ku şerê Gilgameş bike.

Xweda Aruru destên xwe şiştine, hinek xeriya sor girtiye nav destên xwe, bi tif a xwe ew şil kiriye û paşî jî şikl dayê, yê ku wekî xortek bihêz û mêrxas diyar bûye. Dil û rix daye xortê mêrxas û ew - Enkîdu binav kiriye. Xwedêyan, Enkîdu rêkirina dinyayê, çarenûsa wî nivîsandin e, da Gilgameş rawestên e.

Demek dirêj Enkîdu di nav heywanên nekedî û drinde de jiyaye. Wekî xezalan xurt û wekî şêran bihêz bûye. Bi van heywanên nekedî re hevaltî girêdaye û bi wan re çûye nêçîrê, çûye avvexwarinê. Her wekî yek ji wan, ew jî jiyaye. Mirov nasnekirin e, nizanîbûye ku gund û bajar hene û tu caran jî te'ma nan û xwarina çêkiri nekiriye. Wekî heywanan, wî jî geya xwariye, bê ku mêwan biqeşêre qurpandiye, wekî heywanan jî pirç bi laşê xwe ve berda ye. Pora wî ji serê wî ve hatiye xwar û ber çavên wî girtine, biser guhên wî ve hatine, simbêl û rih a wî gelek gelek dirêj bûn e, lê ew tiraş nekirin e. Enkîdu kêf û xweşî, eşk û hêvî çi ne , nasnekiriye, lê dîsa jî bi kêf bûye.

Carek ji caran nêçîrvanek hatiye van cîhan. Gava ev heyvanên zêde li vî cîhî peydakiriye, bêgûman gelek şad bûye. Li her cîhê girîng, ji bo nêçîrê daf daniye, da zêdetir heywan bidest kevin. Roja din, gava hatiye, da çi bibîn e ? Daf ên wî hemû hatine hilweşandin û qetandin. Yek heywan jî neketiye destên wî. Çawa gihiştiye daf a xwe ya dawîn, ku bi hêvî ber bi wê ve çûye, tiştê ku dîtî ew mat kiriye. Baweriya wî bi çavên wî bi xwe nehatiye. Li wê dê nêçîrvan, Enkîdu yê girs dîtiye, yê ku erd a daf di bin de hatine danîn, dikole, ji bo ku tu xerabî neyê serê dirinde ( heywanên hov ) yên hevalên wî. Gava ev tişt dîtiye, tirsek mezin ketiye dilê nêçîrvan û wî bi lez û bez ev cîh terkkirine, zîviriye mala xwe.

- Ez çûm daristana, ku gelek dirinde li wir dijin - nêçîrvan, gotiye bavê xwe - û li ser vê yekê jî, ez bê nêçîr vegeriyam malê. Li wan cîh an, zilamek girs û girtole dijê. Laşê wî wekî yên dirindan bi pirç bûye û por û rihek dirêj ketiye ser rûyê wî. Ew, wan dirindan diparêzê û li ber min bû asteng a herî mezin da ez nêçîra xwe bikim. Gava min ew dît, tirs kete dilê min. Li hember wî, kesê ku xwe bigre û netirse nî ne.

Bav, weha bersîva kurê xwe da ye :

- Lawo, ger ev zilam weha bihêz, girs û mêrxas be, tenê Gilgameş dikare serî lê bitewîne. Di cîhana me de, kes ji Gilgameş bihêz û dilawertir tune ye. Biçe ba wî û te çi dîtiye jê re bibêje. Tenê ew dikare çareyekê ji te re peyda bike.

Nêçîrvan bi ya bavê xwe kiriye. Li ser şêwra bavê xwe daye rê, gihiştiye bajarê Uruk û mecala dîtina Gilgameş bidest xistiye. Bi meraqa dîtina mêrxasê herî navdar ê dinyayê, derketiye pêş Gilgameş.

- Ey Gilgameş ê mezin û hêja. Ez çûm nêçîrê, di daristanek ku gelek dirinde li wir hene. Lê, sed mixabin girsekî mêran ez dam rawestandin. Hemû daf ên min ax biser wan de kiribû û ew xerakiribûn. Ez vêce tu caran newêrim bi wan cîhan ve herim, heta ku ew dirinde yên wir biparêze, kesekî din jî ez bawer nakim bikaribe nêçîrê li wê daristanê bike. Ji ber ku kes nikare bi wî re biserî derkeve.

Gilgameş, destê xwe daniye ser eniya xwe û ketiye ramanan de. Dawî gihiştiye encamê :

- Ezê keçek gelek xweşik û ciwan bidim te. Tê wê bibê daristanê. Gava wî, ev keça delal dît, dê dilê wî bikeviyê û evîndarê wê be. Piştî, dê ji bo viyana xwe, dev ji wan cîhan berde û dê daristan dîsa bibe cîhê nêçîrê.

Nêçîrvan tev keça xweşik û delal, ku Gilgameş dayê, ji bajêr derketiye. Roja sêyem gihiştiye daristana ku Enkîdu dijê. Nêçîrvan gotiye keçikê, da li ber gola di nav daristanê de danişê. Li hêviyê bimîne, heta Enkîdu tî bibe û were ber golê. Hingê dê ewê vê keça delal bibîne û her tişt wekî Gilgameş gotî, dê wekî pêwîst pêk bê.

Keçik çûye li ber golê rûniştiye. Gelek dem derbasnebûye û wê dengên dirindan, ên ku ber bi golê ve tên

bihîstiye. Gava ew nêzîkbûne, wê di nav wan de, girsê mêran - Enkîdu dîtiye. Enkîdu heta wê demê keç di jiyana xwe de nedîtibûye, ji ber vê, tiştê dîtî ew behitandiye. Her çend di tevaya jiyana xwe de di nav heywanan de jiya bê jî, dilê Enkîdu dilê insanan bûye û hîsên wî jî yên mirovan bûye. Yekcar dilê wî lêdaye û cara yekem evîndar bûye. Dev ji dirindan, daristan û jiyana xwe ya heta hingê berdaye û da ye dûv keçika ciwan û bedew.

Cara yekem Enkîdu bi insanekî re peyivî ye. Cara yekem gotinên mirovan ji devên wî derketine. Bi keçikê re bi rojan jiyaye û guhdariya axaftina wê, li ser bajarê xweş Uruk, li ser mêrxasê mezin Gilgameş, li ser avayiyên Uruk ên zexm û qewîn, li ser qesrên spehî yên mîran û li ser jiyana bajarîtiyê kiriye. Enkîdu jî xwestiye, li ser jiyana mirovan bi dirindeyên hevalên xwe re bipeyive. Lê, heywanan hew guh daye Enkîdu. Ji ber ku, vêce ew jî bûye xwediyê jiyana mirovan. Wî hew " xwe layiqî jiyana wan " dîtiye. Gava Enkîdu xwe nêzîkî xezalan kiriye, ew ji ber reviyane, gava xwe nêzîkî fîl, piling, şêr an dirindên din kiriye, qet guh nedanê de. Wan jî destpêkiriye, da Enkîdu jibîr bikin. Xwestine ew ji nav wan bar bike. Ew piştî dîtina keçika delal, ne yek ji wan bûye.

Enkîdu dîtiye, ku hezkirina berê di navbera wî û heywanan de nema ye. Wî jî destpêkiriye hevaltiye xwe û keçika ku dilê wî tê de ye kurtir bike. Berê xwe da ye keçikê û daxwaza xwe aniye zimên :

- Ez hêvî dikim, tu min jî bi xwe re bibe bajarê Uruk,

cîhê ku di bin destê Gilgameş ê mezin de ye. Ez dixwazim, ku ez hêza xwe pêşberî ya Gilgameş rakim. Em pêşbazî ya hev bikin.

Ji xwe keçik jî, li hêvya vê xwestina Enkîdu bûye. Bi destê wî girtiye û bi hevre dane rêya Uruk' ê. Bi vî awayî Enkîdu daristan terkkiriye û ber bi jiyanek nû ve çûye.


Keçikê yekcar Enkîdu nebiriye Uruk. Pêşî ew biriye gel şivanên ku pazên bajariyên Uruk di çêrin. Şivanan di wê demê de xwarina xwe ya nîvrokî xwarin e. Çawa wan Enkîdu dîtiye, çavên wan beloq bûn e.

- Ev kî ye ? Ev ê weha bihêz û girs kî ye ? Laşê wî wekî yê Gilgameş e. Lê, tev bi pirç e, por û riha wî çima weha dirêjin ( ! ) ?

Bi vê meraqê, her li Enkîdu temaşe kirine. Ew û keça li gel ezimandina cem xwe, nan û şerab pêşkeşî wan kirin e. Enkîdu cara yekem nan xistiye devê xwe û bi wî gelek xweş hatiye. Cara yekem şerab vexwariye û mest û serxweş bûye. Dilê wî şa bûye, ku ew jî mirov e û xwestiye wekî wan be. Xwe şiştiye, por û riha xwe jêkiriye, bêhnên xweş li xwe dan e. Wê demê şivan şaş û gêj bûn e , ji hevdu re gotin e :

- Ya Xwedayên mezin, ew çiqasî dijbihê Gilgameş ( ! )

- Vê şevê hûn dikarin rehet razin - Enkîdu gotiye û rima xwe hildaye - pêwîst nake, ku hûn dewaran jî biparêzin. Ezê îşêv cîhê we bigrim.



Wê şevê şivanan bi rehetî xwe dirêjkirine û xewa xwe kirin e. Enkîdu li ber dewaran bûye û ne şêr û ne tu dirindeyên din wêrî bûn e, ku werin nêçîra - pezên ku Enkîdu li ber wan e.

Şevek giran xwe berdaye ser derdorê, ser rezên fereh û bi berhemên zêde, ser daristanên hêşîn, ser çemê Firat, ser bajarê Uruk. Li Uruk'ê Gilgameş ê bihêz, li ser cîhê xwe, xwe biriye û aniye - xew neketiye çavên wî. Gava çavên wî hinek bi ser hev ve çûne jî, xewên nexweş dîtin e.

Sibehî wekî serxweşan bûye. Her çend roj derketiye û rohnayiya xwe daye ser bajarê Uruk jî, hîn jî Gilgameş serê wî di xewnên şeva berê yên erjeng û xerab de bûn e. Li dayika xwe geriya ye, ji bo ku tefsîra xewnên wî bike û jê re bibêje maneya wan çi bûye.

- Dayê - gotiye - vê şevê min di xewna xwe de ezman dît, a ku bi stêrkên fesîh ve dagirtîbû. Yek ji wan ket û bû bar li ser pişta min. Min xwest ez vî barê giran ku Xweda Anu ji jor ve rêkiriye, ji ser pişta xwe hilînim. Lê, hêz nedigiha min, ez bêhêz dibûm û min nikarîbû ez jê rizgar bibim. Tevayiya bajarê Uruk li derdora stêrkê kom dibûn. Min bi hemû hêza xwe û ji bo alîkariya min rûniştvanên Urukê jî bihevre, me stêrk hildida û min ew stêrk ji te re dianî.

Dayika Gilgameş a zîrek ku bi xwe xweda bûye, hinekî raman kiriye û bersiva lawê xwe weha da ye :

- Gilgameş, hevalekî te dê ber bi te ve were. Li daristanekê de, di nav dirindeyan de jiya ye. Ew, yekî gelek bihêz û girs e. Tevayiya rûniştvanên bajarê Uruk' ê, dê ji xebat û kirinên wî heyran bimînin. Ti bi xwe jî, dê dilşa be, gava ti wî bibîn e.

- Dayê - gotiye Gilgameş - îşev min xewnek din jî dît. Di kolanek ji yên Uruk' ê de, min bivirek di dît. Bivirek gelek ecêb bû. Min tu caran bivirek weha nedîtibû. Tevayiya xelkê li derdora vî bivirî kombûbûn. Min jî ew di hilgirte milê xwe. Kêfa min ji bivir re hat û ew li ser milên min, ez bi şahî birêve diçûm.

- Ev bivir hevalê te ye - diya Gilgameş gotiye - yê ku nêzîkî bajarê Uruk dibe û dê di demek nêzîk de, bikeve nav kolanên Urukê. Tê ji wî hizbike, Gilgameş. Ew, dê bibe canhevalê te.

Di dema ku Gilgameş bi dayika xwe re li ser xewnên xwe xeber dida, Enkîdu bi keça li gel re, nêzîkî derîyê bajarê Uruk dibû. Berî ku bikeve bajêr, mêrek wî dibîne, yê ku bi zorê birêve diçe. Bi dîtina Enkîdu re destpêdike, ku bilerize.

- Ji bo çi, tu weha dilerize û tu ji çi ditirsê ? Enkîdu ji zilam pirsiye.

- Way mîrê min, min got belkî ez Gilgameş dibînim. Weha bihêz, weha girs, weha xurt...Min got ev mîrê me Gilgameş ê mêrxas e.

- Ez ne Gilgameş' im - Enkîdu bersîva xwe da ye - Ez

diçim ku pêşbaziya wî bikim. Em, hêza xwe bidin pêşber hev.

Gava zilam ev gotinên Enkîdu bîhîstine, xwestiya çend şîretan li wî bike :

- Belê ezbenî, tu mêrxasî. Lê, Gilgameş bihêz û nebez e. Binêre ez çend hejar im û çawa bi zorê birêve diçim. Hêza min li kûdê ye ? Bircên Uruk ji min girtin. Avayiya Gilgameş! Wî, kêf û şadiya me, ji destê me girt. Ez hizjêkirina xwe, ji bo zarok û jina xwe, nikarim diyarbikim. Çima ? Ji ber ku, ji demek dirêj ve ye ku çavên min li yên wan neketiye. Her roj, em li cîhekî cuda kardikin. Ji bo çi ? Ji bo deng û navdariyek zêdetir, bo Gilgameş.

Zilam bi van gotinan, hîsên xwe aniye zimên. Paşî wê jî, dengê xwe biriye û bi rêka xwe ve çû ye.

Enkîdu bilez xwestiye xwe bighîne deriyê bajêr. Ketiye bajarê Uruk. Bi derbasbûna wî re, xelkê hemûyan berê xwe dan e wî - bi meraq û heyret lê temaşe kirin e. Ji xwe re gotin e - Ya xwedayên mezin, ew çend dijbehê Gilgameş. Lê, Enkîdu ew nedîtin e. Çavên wî tenê li tiştekî geriyan e. Yekî wekî xwe girs û mezin - Gilgameş bibîn e. Yekcar jî pê re bikeve pêşbaziyê. Çawa nêzîkî qesrê bûye, xwestina wî hatiye cîh. Gilgameş dîtiye! Bi gavên lez xwe gihandiyê û li ber deriyê qesrê rawestiya ye.

Gilgameş berê xwe daye Enkîdu. Lê, meyze kiriye, meyze kiriye... Bi rastî jî kêfa wî ji Enkîdu re hatiye.

Enkîdu jî, rê li ber Gilgameş girtiye û nehiştiye ew bikeve qesrê de. Heta wê demê tu kesî rê li ber Gilgameş negirtibûye, kesî newêrabûye xwe li ber Gilgameş hilde. Agir ketiye laşê Gilgameş - çawa yek dê rê li ber bigre. Her du destên xwe li dora pişta Enkîdu pêçane û her du girsên mêran wekî du gamêşan dest bi şer kirin e. Her du bi kabokan ve ketine erdê, ji hêza wan kevirên birca Urukê ketin e, ji hêza wan erd hejiya ye. Gilgameş jî, Enkîdu jî tevayiya hêza xwe pêşberî hevdu bikar anîn e. Gilgameş ji pişta Enkîdu girtiye û bi hêz xwestiye wî bi ber xwe ve bîn e. Çawa ku li ser kabokan bû ye, wî Enkîdu hildaye û wekî nîşana serfiraziyê destên xwe bilind kirin e.

Gava dîsa lingên Enkîdu erd girtine, Gilgameş ew himêz kiriye, maç kiriye û pêşniyarî kiriye da bibin hevalên hevdu. Ji wê demê ve ew her bi hev re bûn e. Gilgameş xwestiye Enkîdu her li gel wî bê û Enkîdu jî hevaltî çi ye, bi awakî herî rast naskiriye.

Gilgameş ê leheng nizanîbûye ku vala bimîn e. Serketinên nû her di mêjiyê wî de bûn e. Birca ku li derdora Uruk'ê de daye avakirin têrî nekiriye.

- Ya hevalêmin ê hêja û bihêz - Gilgameş ji Enkîdu re gotiye - di wê daristana han a mezin ku tu dibînî de, xûtê xerabiyê Xuvava dijê. Bi min re were, da em wî bikujin. Em dinyayê ji vê xerabiyê xelas bikin.

- Tu dixwazê ku Xuvava bikuje (!) - Enkîdu serê xwe hejandiye - Tu zanê, ku tu ji şerekî mezin û newekhev re xwe amade dike? Ez gelek caran, gava di daristanê de

dijiyam, ji nêzî daristana ku di bin destê Xuvava de ye jî derbas bûm e. Ew li ser erdek gelek fereh de ye û kes jî newêrê bikeve nav. Mezinbûna wê biqasî şêst caran du saetan mirov dikare lê bigere. Min bi xwe tu caran newêrî bûye bikevim wir. Tu zanê, bê çi deng li ser hûtê Xuvava ye ? Ew wekî bahozê li ser deryayan difire û pêlên weha derdikevin, ku keştî û mirov di berde diçin. Dengê wî wekî tayfûnê bi ser erdê ve diçe û dar xwe ditewînin û dişikihin, çiya li ber dihejin. Devê Xuvava wekî şikefteke agirî ye û bêhna wî tê maneya mirinê. Qet şer bi Xuvava re bere ji serê te derbas nebe. Ez dikarim vê ji te re bibêjim.

Gilgameş baş guhdariya hevalê xwe kiriye. Weha jî gotina xwe jê re nîşan daye :

- Gelo tu ditirse ? Ew kesê şer hemberê Xuvava rake, dê navê xwe nemîr bike, dê navê wî her û her bibîr bê. Tu caran li ser rûyê vê erdê ew dê nemire.

- Na, ez natirsim - Enkîdu bersîva xwe da ye - tu caran jî, di vî şerê newekhev de ez te tenê nahêlim.

Gilgameş bangî çêkerên herî navdar kiriye. Xwestiye çekên herî baş çêbikin. Ewan jî , hasin û pola ya herî qewîn xelandine. Ji wan bivir, rim, kevan û mertalên mezin çêkirine, yên ku li egît û qehremanan hatine. Ji zêr bi xwe jî, xencer û şûr çêkirin e.

Gilgameş ji tevayiya welatiyên xwe yên Urukê xwestiye û wî bi xwe jî duayên xwe gihandine Xwedêya rojê Şamaş, ya ku piştgira egîdan bûye. Urukiyan dua kirine

ku di şerê hemberî Xuvava de, Gilgameş û Enkîdu biserkevin.

Roja ku ewê ji bajêr xatirê xwe jî bixwazin hatiye. Gilgameş û Enkîdu şûrên xwe dane ber xwe, kevan û mertalê xwe dane pişta xwe, bivirên xwe bi destên xwe girtine û derketine. Xelkê bi rûmet û rêz li wan temaşe kiriye. Heta ber deriyê Uruk jî li gel wan çûn e.

Gilgameş û Enkîdu ji bajêr derketine û dane rêya dûr, ber bi daristana ku Xuvava dijê. Piştî bîstûdu saetan birêveçûn, rûniştine da xwarina xwe bixwin. Paşî sîhûdu saetan jî cîhek ku dikarin bêhna xwe bidin peyda kirin e. Berî ku xwe dirêj bikin, bîrek kolandine û cewenkeyên xwe bi ava paqij û cemidî dagirtine. Piştre jî, Gilgameş hinek ji ava sar û paqij, ji bo pêşkeşiya Xwedaya Şamaş rijandiye.

Her roj hewqas rê meşîne, ya ku revingên herî bilez bi xwe nikaribûn e. Piştî sê rojan gihiştine cîhê xwe, yê ku kesekî din karîbûye di meh û nîvê de bigihijê. Hêza Gilgameş û Enkîdu ne wekî ya mirovên din bûye.

Di hênikayiya şevê de bîrek kolandine û carek din extiyata xwe ya avê girtin e.

- Ez van cîhan nasdikim - Enkîdu gotiye - carnan li gel dirindeyên xwe ez dihatim heta van cîhan. Daristana Xuvava li van nêzîkaye. Sibehî li cîhê ku em dikarin bikevin daristanê, emê parêzvanê daristanê bibînin. Tu rêyên din jî, ku em bikevin nav daristanê nîn e. Parêzvanê Xuvava jî mirov nikare ne bi tîrê, ne jî bi

şûr brîndar bike. Heft kiras lêkirîne û mirov nikare wan qul bike, nemirina wî jî, ji ber wan e.

- Li ser sibê tu ramanan neke - Gilgameş bersîva Enkîdu daye - Raweste, sibe bi xwe dê rêça me nîşanî me bike.

Gilgameş xwe dirêj kiriye û raza ye. Lê demek dirêj Enkîdu nikarîbûye raze, çavên xwe li cîhên ku berê jî nasdike gerandiye, sîh a şevê xwe berdabûye ser daristanê. Tirs qet neketiye dilê wî, lê wekî mirovekî ku nêzîkî mirinê dibe, li berxwe ketiye.

Sibehî zu her dû heval - Gilgameş û Enkîdu şiyar bûn e. Cilên xwe li xwe kirine, çekên xwe girêdane û xwe dane rêya daristana Xuvava. Ji dûr ve li ber cîhê ketina daristanê parêzvan dîtine, yê ku herema di bin desthilatiya Xuvava de diparêze. Parêzvanê hûtê Xuvava, di wê demê bi xwe de kirasên xwe li xwe kirine. Yek dabûye pişta xwe û şeşên din jî li ser geya bûn e, ku parêzvan wan jî li xwe bike. Gava ku parêzvan destê xwe avêtiye kirasê dûwem, Gilgameş û Enkîdu kevanên xwe amade kirin e û tîrên xwe avêtin e. Her du tîr li nîvê dilê parêzvan ketine û ew di cîhê xwe de miriye.

Gilgameş bi kêf berê xwe daye Enkîdu :

- Astenga yekem me ji holê rakir.

Enkîdu bersîv nedaye û hêdî hêdî birêve çûye. Gilgameş ketiye nav daristanê, lê Enkîdu dudil bûye.

- Ev çiye ? Hîn jî tu dudil î ? Gilgameş ji Enkîdu pirsiye. Enkîdu jî di nav mitalan de weha bersîva Gilgameş daye :

- Hevalê min ê hêja - Gilgameş, ka em nekevin daristanê. Berî ku em werin sînorê daristana Xuvava, bi tîrê min destê xwe brîndarkir. Hêza destê min şkestiye, wekî berê ne bihêz e.

- Were, were - Gilgameş gotiye - gava ku te Xuvava dît, dê hêzek nu werê te. Daxwaza şerê Xuvava dê dilê te dagre, êş çiye tê jibîr bike.

Bêguman Enkîdu nexwestiye hevalê xwe tenê bihêle. Ew jî li pey Gilgameş ketiye daristanê, lê dudilî hîn jî pê re hebûye. Demek baş birêve çûne û gihiştine qesra Xuvava. Gilgameş bivirê xwe hilgirtiye û destpêkiriye da spîndaran jêbike. Xwestiye daristana Xuvava windabike.

Gava ku dengên bivirê gihiştiye gûhê Xuvava, şêt bûye. Ji devê wî agir bariya ye. Qêrînek daye û erd hejiya ye.

- Kî diwêre spîndarên min jêbike ? - pirsiye - xweşikahiya çiya û daristana min ji holê rake ?

Gilgameş tu bersîv nedaye û dom kiriye da spîndaran jêbike. Hêrs û serbilindayî, di rûyê Gilgameş de xwe nîşan dan e. Destê xwe avêtiye hebûna Xuvava.

Wê gavê Xuvava ji qesra xwe derketiye û rûyê

xwe yê ku mirov dibehitêne nîşan kiriye. Xwestiya mirinê bike nesîbê neyarên xwe. Di vê demê de Xwedayê rojê Şamaş dîtiye, bê çi raman ji serê Xuvava ve derbas dibin. Wî bahozên herî dijwar rêkiriye hemberê Xuvava - bahoza germ, bahoza qeşayî û tayfûn şiyandiye pêşberê Xuvava. Wan Xuvava rawestandine û bêhna mirinê ji nav lêvên wî kişandin e. Bi dîtina vê rewşê re, yekcar Gilgameş şûrê xwe kişandiye û ew avêtiye stûyê Xuvava. Enkîdu jî şûrê xwe li serê Xuvava xistiye. Di derbeya sêyem de hûtê Xuvava li erdê ketiye. Bêdengiyek giran xwe berdaye derdorê.

- Astenga herî mezin jî me ji holê rakir - Gilgameş gotiye û şûrê xwe daniye ser sînga Xuvava yê mirî. Bi kabokan ve rûniştiye û berdewam kiriye ku ji Enkîdu re bibêje - Divê heta dawî em daristana Xuvava bibirin. Darek tenê jî, divê Xuvava bibîr neyne, xerabî da bête jibîrkirin.

Gilgameş û Enkîdu destpêkirine da hemû daran jêbikin. Jêkirine, heta di binê çiyê de darek tenê maye. Ji rêya ku hatine jî vegeriyane. Her du mêrxas gihiştine Uruk. Li her cîhê ku jê derbasbûne, gel bi şahiyek herî mezin derketiye pêşya wan û rêza xwe ji bo wan diyarkirin e.

Gilgameş tac a mîrîtiyê gava da ye ser serê xwe û şal ê mîrîtiyê avêtiye pişta xwe, Xweda İştar ew dîtiye. Wê carek din bala xwe daye ku Gilgameş çend xurt, çend bihêz û çend lewend e. Dîtiye ku bruskên serfiraziyê ji çavên wî, xwe diyar dikin. Dîtiye ku çend ciwan û levhatiye - Gilgameş. Yekcar ji esmanan daketiye û hatiye

gel Gilgameş û gotiyê de :

- Ey mêrxasê Gilgameş, bibe mêrê min. Ezê erebeya herî xweşik ji bo te bidim amadekirin, bere tevayiya wê ji zêr bê. Hespên herî bilêz dê erebeya te bajon. Ba û bahoz dê nikaribin bigihijin te. Gava piyê te bi mala min ket, mermerên erdê dê piyê te maçbikin. Mîr, paşa û qral dê werin ber lingên te, dê bi kabokan li ber te xwe bavêjin erdê. Dê diyariyên herî xweşik ji te re bînin.

Gilgameş bê ku tu ramanên kur bike, weha bersîva Xweda İştar daye :

- Na ! Ez naxwazim te wekî jin ji xwe re bînim. Heta nuha te ji kê hizkiriye, te tenê bela û xerabî anîne serê wî. Te mêrê xwe Tamuz rêkire cîhana binerdî. Ez jî dê di demek kin de nifrên te bikşînim ser xwe. Ev navdarî û şopa min hiştî, dê bibin şerm, kes dê naxwaze navê min bîne bîra xwe.

Van peyvan dilê İştar gelek şikandine. Bilez derketiye esmanan, bi hêrs û ecza dilê xwe, derketiye pêş bavê xwe - Xwedayê esmanên herî bilind Anu û derd û kulên xwe li ber rijandine :

- Gilgameş berda min û ez ji qesra xwe avêtim. Ji bo vê kirina xwe, ew divê bê cezakirin. Yabo, ez hêvî dikim, gamêşek esmanî çêbike û wî rêbike hemberê Gilgameş. Da bi stiriyên xwe laşê Gilgameş qul qul bike û dawî jî pêlî bike. Ger tu weha nekê, ez dê deriyê cîhana binerdî bişkînim, ji tarîtiya wê derê ezê miriyan derbixim û wan berdim cîhana sererdî, da hemû tiştên

dijin bixwin. Dê mirî zora her tiştên bican bibin, ji ber ku zêdetirin û li ser rûyê erdê dê mirin desthilatiyê bike.

Bi nedilxwaziya xwe, Xwedayê esmanên bilind Anu gamêşê esmanî çêkiriye û ew rêkiriye ser rûyê erdê. Gamêşê hov û girtole li tenişta berava çemê Firatê rawestaye. Qêrînek daye û bi qêrîna wî re çem veqetehaya du beşan û rûniştvanên Uruk'ê ketinê de. Cara duwem dîsa qêrînek daye, vê carê erd a li pêşya wî qeliştiye û dused kes ji Urukê ketinê de. Gava ku cara sêyem qêrîn daye, erd qeliştiye û perçeyên latan ji bin erdê ve firiyane jor. Di vê demê bi xwe de, çavên gamêş bi Enkîdu ketiye. Yekcar xwe avêtiye ser, da wî biqurpîne. Enkîdu wxe avêtiye alî û stirhên gamêş girtine. Gamêş ê ku pir acizbûye, bêhna xwe ji pozê xwe ve berdaye, bi bêhndan a wî re Enkîdu li erdê ketiye û gamêş bi tiriya xwe lê xistiye.

Ji dengê ecêb ku tê, Gilgameş ji qesra xwe derketiye, da bibîne ku çi çêdibe ? Gava rewşa Enkîdu dîtiye, xwe avêtiye pêş, da alîkariya hevalê xwe bike. Agir ji çavê gamêş bariye û erda di bin piyê wî de bi vir û wir de hejiyaye. Gilgameş bangî Enkîdu kiriye :

- Tiriya gamêş bigre ! Wî bigre, ji bo ku ez şûr bavêjim navbera stirih û stûyê wî.

Enkîdu xwe carek din avêtiye pişt gamêş û bi tiriya wî girtiye. Gilgameş jî xwe avêtiye meydana şer û şûrê xwe li navbera stû û stirihên gamêş xistiye. Paşî jî dilê gamêş ji nav sînga wî derxistiye û wekî qurban pêşkeşî

Xweda Şamaş kiriye.

Stirihên gamêş jî jêkirine û ew dane hostayan da pertal û eşyayan jê çêbikin. Hostayan jî berhemên gelek xweşik pêkanîne. Piyaleyên curbecur ji stirihên gamêş pêkanîn e. Gilgameş piyale bi rûn ve dagirtine û ew jî pêşkeşî Xweda Şamaş kirin e.

Xweda İştar şerê di navbera Gilgameş û Enkîdu bi gamêşê esmanî re dîtiye. Lê dîsa jî nikarîbûye, li pêş serfiraziya her du mêrxasan bibe asteng . Wê jî, xwe berdaye ser birca Uruk û ji wir nifir li Gilgameş kirin e. Nifirên wê hatine guhên Enkîdu. Wî jî ranên gamêş jêkirine û avêtiye Xweda İştar. Lê, dîsa jî nikarîbûye nifirên wê rawestên e.

Li kolan û meydanên Uruk'ê, rûniştvanên bajêr kombûn e. Hemû li hêviyê bûn e, ku her du qehreman ji ber wan ve derbas bibin û slava xwe li wan bikin.

Gilgameş û Enkîdu di ava Firatê de xwe şiştin e. Destên xwe avêtine ser milên hev û ketine bajêr. Ji her cîhên ku derbasbûne, gel şahiyên mezin lidar xistine. Kêfxweşiya xwe anîne zimên, navên wan bilind kirin e, xwe nêzîkî wan kirine, tenê ku destên wan li yên her du egîdan bikeve. Gilgameş jî, li qesra xwe dawetiyek mezin pêkaniye. Bangî tevayiya gelê Uruk'ê kiriye. Dengê ken û şahiyê ji qesra Gilgameş gihiştiye esmanan. Tirsa ku gamêş anîbûye, bi vê şahiyê ve hatiye jibîrkirin û windabûye.

Heta derengê şevê şahî kirine û paşî jî her du mêrxas

razan e. Vê şevê, xewnek ji Enkîdu re aniye .

Li esmanan xweda civiyan e û peyivîne, ku kî ji her du qehremanan divê bimre. Hin ji wan, pesnên Gilgameş dan e, ku gamêş kuştiye û hin ji wan jî li hember rabûn e.

Wê gavê Xwedayê erdê Enlîl rabûye û gotiye :

- Enkîdu bere bimre !

Enkîdu di nav xuhdanê de ji xewna xwe rabûye. Her derên wî lerizîne, Gilgameş ji xew rakiriye û jê re gotiye :

- Gilgameş, min di xewna xwe de dît, çawa xweda hemû bi hev di şêwirin û biryara mirina min didin.

Gilgameş destê xwe daniye ser eniya Enkîdu, tê gihiştiye ku ew çend tirsiya ye.

- Na, hevalê min tê nemirê. Divê ku tu nemirê - bihêdî ji Enkîdu re gotiye, lê ev peyv qet ji alî Enkîdu ve nehatine bihîstin, ramanên wî li dûr bûn e.

Enkîdu xwe dirêjkiriye. Bûyerên hatine serê wî carek din ji ber çavên wî derbasbûne. Wê gavê nifirên xwe li nêçîrvanê ku keç aniye gel û keça ku ew aniye nav mirovan kiriye.

- Ez daxwaz dikim ku xerabiye herî mezin ku dikare werê serê mirovan, werê serê we. Ger hun nebane, ez

nedihatim nav mirovan û ezê di nav dirindeyên xwe de bijiyam.

Xweda Şamaş, nifirên Enkîdu bihîstine û ji bilindayiya esmanan ve dengê wî gihiştiye ser rûyê erdê :

- Enkîdu, nifiran li mirovên ku başîtî bi te kirine, neke. Nêçîrvan û keça wî anî gel te, rêya ku digihije mirovatiyê nîşanî te kirin. Tu fêrbûy ku nan bixwê, navê te di nav milet de belavbû. Tu di nav mirovan de bûy xwedî nav, di nav mirovan de te hevalê xwe yê herî baş Gilgameş naskir. Di daristanan de wekî dirindeyekî tu dijî, kesî tu nasnedikir. Nuha tevayiya xelkê Uruk'ê, dê ji bo te hêstiran birijîne û ji bo te Gilgameş dê ji nav mirovan derkeve û dê biçe nav çol û daristanan.

Piştî peyvên Xweda Şamaş, dilê Enkîdu rehet bûye. Raza ye û xewnek giran xwe avêtiye ser.

Melayketek girs bi baskên qartel û serê şêr hatiye ser cîhê Enkîdu û ew bi xwe re biriye ser çemê agirî yê cîhana din. Melayket cilên Enkîdu jê derxistine û ew tazî kiriye, weha tazî ew xistiye nav çemê agir. Paşî jî çermê mirovî yê Enkîdu, bi yê çûkan ve guherandiye. Enkîdu tê gihiştiye ku çawa bask pê ve bûn e û bi rêyekê ve diçe, ya ku vegerandin jê tune ye. Ketiye cîhana din, a ku tarîtiyê hukm kiriye. Ew kesên ku li aliyê herî tarî bûn e, wekî çûkan bask bi wan ve bûn e û bi ax û remilê xwe têr kiribûn e.

Enkîdu bi tirsek mezin ji xewnê şiyarbûye. dîtiye ku

hevalê wî Gilgameş li ser serê wî ye.

- Min xewna herî reş dît - Enkîdu gotiye Gilgameş - Ez ketim cîhana di bin desthilatiya Xwedêya Ereşkîgal de. Lê, ez vegeriyam ba te. Dîsa jî, di demek nêzîk de, ezê carek din biçim û venegerim.

Enkîdu bîst rojan di nav lerizandin, şewata laş û ta yê de dirêjkirî ma ye. Mirin jî, her li derdora cîhê wî geriya ye.Di roja bîstan de Enkîdu miriye.

- Şiyarbe Enkîdu, şiyarbe ! - Gilgameş bi girî û di nav axînan de, qêrîn dane - Ma tu min nabihîzê ? Nayê bîra te ku çawa me Xuvava windakir, çawa me gamêşê esmanî kuşt ? Rabe û berde vê xewna giran, Enkîdu ! Enkîdu, rabe û hevalê xwe tenê nahêle !

Çawa şêr a dayik, li ser çêlîkên xwe dihezine, weha jî Gilgameş li ser hevalê xwe heziniye. Şeş roj û heft şevan li ber laşê hevalê xwe ma ye, ku ew şiyarbibe. Gava roj bi roj dîtiye, çawa jiyanê rûyê Enkîdu terkkiriye û laşê wî diqermiçe, mirinê xwe avêtiye ser Enkîdu, Gilgameş hew karîbûye xwe bigre. Cilên li ser xwe hemû qetandine. Çermê şêr li xwe kiriye û reviyaye nav çol û daristanan. Bi birêvebûna xwe jî qêrîn û nalîn dane û bang kiriye :

- Enkîdu çû, Enkîdu winda bû, Enkîdu mir !

Tirsa mirinê xwe avêtiye ser Gilgameş jî. Roja dawî ya mêrxas û qehremanan jî tê, Xwedêyan rojên wan jî hejmartî danîn e - Gilgameş ji xwe re gotiye. Êşa Gilga-

meş a ji bo Enkîdu, ew berdaye. Vê carê ew ketiye xema canê xwe. Ji ber wê jî her dur û dur ketiye. " Ezê biçim çiyayê Maşu - ji xwe re gotiye - û li wir ezê seredan a derwêşê xwe yê mezin Ut - Napiştî bikim. Ew jî mirov bû, lê Xwedêyan ew bi nemirinê guhezandin. Bere Ut - Napiştî şîretan li min bike, da ez çi bikim, ji bo ku ez jî nemirbim."

Gilgameş tevayiya rojê birêve çûye, şevê bi xwe jî ew ji rêveçûna wî nerawestandiye. Ber bi berbangê ve, li ber kaşekî xwe dirêjkiriye, da bixew ve biçe. Ji nav du latan şêr derketine. Gilgameş yekcar ji ber xwe xencera xwe derxistiye, êrîşê şêran kiriye û ew ji hev belavkirine. Her yek bi aliyekî ve reviya ye.


Roja piştî wê gihiştiye çiyayê Maşu, yê ku gir ê wî yê herî bilind nêzîkê nizimayiya esman bûye.

Tûpişkên mezin di şiklên mirovan de, li ber cîhê ku yek dikare bi çiyê ve hilkişê, parêzvanî kirin e. Ewan bi qêrînan Gilgameş dane sekinandin, gava ku wî xwestiye ji ber wan derbas bibe.

- Te xêre, tu bi kudê ve dixwaze biçî ? jê pirsîn e. Ji ber çi tu hatiye van cîhan ?

- Ez diçim gel derwêşê xwe yê mezin Ut - Napiştî - Gilgameş bersîva wan daye - Ez dixwazim ji wî bipirsim, gelo divê ez çi bikim, da ku ez tu caran nemirim.

- Tu nikare ji çiyê ve derbas bibe - tupişkan ji Gilgameş re gotiye - heta nuha tu kes nikarîbûyê ji latên



çiyayê Maşu biserkeve. Divê tu dwanzdeh caran bi du saetan birêve biçê, herweha divê tu ji rêya tarî ve derbas bibe, ji ber ku tîrêjên rojê nadin wir.

Gilgameş bi biryar bûye, ji ber vê yekê jî yekcar bersîva wan daye :

- Divê ez derbasbibim ! Divê ez bi derwêsê xwe yê mezin re xeber bidim !

Wê gavê tupişkên mezin rê dane wî, ku bikeve çiyayê Maşu.

Ji rêyên nizm û bilind ve, yên tarî û dijwar ve Gilgameş her birêve çûye û birêve çûye... Çiqasî ku ketiye nav çiyê ve rohnayî hevqasî kêmtir bûye. Ji tarîbûnê nikarîbûye tu tiştî bibîne. Gilgameş piyên xwe bi erdê ve xişkandine û weha bi gavên hêdî hêdî pêşketiye. Li pêş wî û li paş wî tarî bûye, tarîtiyek ji ya şevê reştir. Tenê carnan bayek hînik li rûyê wî xistiye. Gilgameş ê mêrxas weha hêdî hêdî pêşve çûye û gava yanzdeh caran bi du saetan her birêve bûye, cara yekem tîrêjên rohnayiyê destpêkirine rêya wî vekin. Gava dwanzdeh car bi du saetan birêve çûye, vêce gihiştiye rohnayiyek geş a rojê. Derdora wî rohnî bûye.

Gilgameş li pêş xwe bexçeyek herî xweşik dîtiye. Gava gihiştiye wir famkiriye ku dar û mêwên vî bexçeyî ji cewheran e. Herweha fêkiyên wan dar û mêwan jî cewher bûn e.

Gilgameş ji vê bexçeya ku mirov mat kiriye derbas

bûye û gihiştiye nêzîkê xan a Xwedêyan a ku di bin destê Sîdurî de bûye. Gava Sîdurî ji dur ve Gilgameş dîtiye bizdahaye. Gilgameş qerêj û ser û çavên wî bi toz bûn e. Çermê şêr li ser bûye, ya ku qetiyaye. Sîdurî hemû deriyên xanê girtine û wê bi xwe jî di odeyekê de xwe veşartiye. Sulahî, frax û piyaleyên zêrîn jî veşartine, yên ku di wan de vexwarina herî xweş pêşkeşî Xwedêyan kiriye.

Gilgameş gihiştiye ber deriyê xanê û li derî xistiye :

- Sîdurî, derî veke. Ez ne eşqiya me, her çend piştî vê rêya dirêj ku ez bijibihim wan jî, dilê min bi kul û xeman dagirtiye, ez Gilgameş'im ê ku tevlî Enkîdu gel ji belayê Xuvava rizgarkir û gamêşê esmanî kuşt, ê ku şêrên derketine rêya wî belavkirin. Ew Gilgameş'im ez.

- Ger tu Gilgameş ê qehreman bê, çima tu weha hejar û perîşan xuya dike ? - Sîndurî ji Gilgameş pirsiye - Çima rûyê te weha dirandiye û çima tu wekî hejaran bi rêyan ketiye ?

- Ez çawa wekî hejaran xuya nekim, dilê min çawa ne tijî kul û xem be, cilên min çawa weha qirêj nebin, gava min hevalê xwe yê herî nêzîk Enkîdu wendakir. Êşa hevalê min ez bi dinyayê xistim, min xwe avêt çol û daristanan û nuha tirsa mirinê ketiye dilê min jî - Gilgameş lê vegerandiye - Ez dixwazim serekî li derwêşê xwe yê mezin Ut - Napiştî bidim. Ez dixwazim ji wî bipirsim, gelo çawa ez dikarim bêmirin bim. Ger tu rê nasbikî, nîşanî min bide, da ku ez bigihijim gel wî.

Sînduri ji xanê derketiye û rêya deryayê nîşanî Gilgameş kiriye.

- Ji vir divê tu derbasbibe, Gilgameş. Lê, kurayiya vê deryayê nayê hesibandin, dirêjiya wê nayê zanîn. Tenê Xwedayê rojê Şamaş her roj bi ser ve diçe û tê. Di navbera me û Ut - Napiştî de, ev av a mirinê heye. Ya ku heta nuha tu kesî nikarîbûye tê de avjeniyê bike û derbasî aliyê din bibe. Kesî jî newêrabûye biceribîn e. Tenê serkeşê keştiyê Ur - Şanabî karîbûye vê bike. Wî bibîne, dibe ku ew bikaribe destê alîkariyê bigihîne te.

Gilgameş spasiya Sînduri kiriye û vê carê jî bi rê ketiye da di daristanê de Ur - Şanabî peyda bike. Ev zexmetî jî qevastiye û Ur - Şanabî dîtiye.

- Alîkariya min bike, Ur - Şanabî. Ez dixwazim herim gel derwêşê mezin Ut - Napiştî, ji bo ku dermanê nemirinê peydabikim. Rêya ku diçe gel wî jî, ji av a mirinê derbas dibe. Tenê tu dizane, çawa mirov dikare ji ser vê deryayê ve derbas bibe.

- Biçe daristanê, Gilgameş - Ur - Şanabî ji wî re gotiye - bi şêst caran du daran bibire, yên ku biqasî pênc caran bi şêst zend bin û wan ji min re bîn e. Bê wan tu nikarê bigihije ba Ut - Napiştî.

Gilgameş raiştiye bivirê û xencerekê , ketiye daristanê de û destpêkiriye biqasî Ur - Şanabî gotiye daran bibire. Dawî ew ji Ur - Şanabî re anîne.

Di vê demê de, Ur - Şanabî jî keştiye xwe ji rê re

amade kiriye. Wî darên ku Gilgameş anîn e li keştiyê kirine û her du bi rê ketin e. Sê rojan keştiya wan ji ser wê deryayê ve çûye, ya ku her roj Xwedê Şamaş ji ser ve derbas bûye. Piştî sê rojan ketina nav av a mirinê. Di wir de keştî ji xwe re rawestiya ye, herwekî ku lat li pêşiyê ne.

- Zû, zû - Ur - Şanabî ji Gilgameş re gotiye - raje darek ji wan, berde nav avê û bi hemû hêza xwe ve me bi pêş bixe. Lê, ji xwe hayedar be, da peşkên av a mirinê li te nekevin, paşî wî darî bavêje û raje yekî din. Ji bo her carekê darekî bikar bîn e. Tevayiya hêza xwe bikar bîne, da ku em pêşkevin.

Çawa ku Ur - Şanabî gotiye, Gilgameş jî weha kiriye. Dar piştî darê raiştiye û keştî bipêş xistiye. Bi zanabûn û hêzek zêde Gilgameş ev erka xwe jî bicîh aniye. Dawî wî û Ur - Şanabî jî dîtine, ku dar têrî wan nakin û hîn jî, ji av a mirinê derbas nebûn e. Wê gavê Gilgameş, cilên li ser xwe derxistine. Xwe tazî kiriye û cilên xwe bi ser xwe ve xistine, ba jî hatiye û keştiya wan hêdî hêdî dîsa bi rê ketiye.

Ji av a mirinê derbas bûn e. Ji dur ve berav diyar bûye. Li beravê jî Ut - Napiştî rawestay bûye. Nizanîbûye ku kî tê. Xizir kiriye ku yek ji rêvîngan Ur - Şanabî ye, lê yê din kî ye, qet nizanîbûye. Gava ji keştiyê peya jî bûn e, ew nasnekiriye.

- Tu kî yî ? ji Gilgameş pirsiye - ji rûyê te diyare ku te gelek êş û xem xwarine.

- Ez ji bajarê Urukê têm - Gilgameş bersîva wî da ye - piştî mirina hevalê xwe yê herî nêzîk ez bi rêyan ketim, tunebûna wî laşê min tijî xem dike. Di jiyana xwe de hevalek min wekî Enkîdu tunebûye. Bi wî re min wexşê Xuvava kuşt, bi wî re min gamêşê esmanî kuşt. Ez Gilgameş im, ê ku di rêya xwe de şêr ên hatine pêşya wî belavkirin. Gelek caran bi mirinê re ez berçav hatim e, lê cara yekeme ku piştî mirina hevalê min Enkîdu, mirina rastî çiye min naskir. Mirina wî ya min jî têne berçavê min. Ez naxwazim min bixin bin axê, ez naxwazim bibim ax. Ya Ut - Napiştî yê mezin, şîretekê li min bike, ez çawa nemirinê peyda bikim. Tenê te wekî mirov nemirin peydakir, bêje min, çawa ez jî bibim xwediyê vê diyariya Xwedêyan.

Ut - Napiştî serê xwe hejandiye :

Daxwaza te gelekî ecêb e, Gilgameş. Gelo mirov xaniyê xwe ji bo heta hetayê çêdike ? Gelo tiştek li dinyayê heye, ku heta hetayê bimîne û winda ne be ? Ji dema ku tê zanîn ve, dinya tê guherandin û rojên mirovan jî hesabkirî ne. Ez çi şîretê dikarim li te bikim ?

- Têrî min dike, ku tu bibêjê, çawa tu bûye xwediyê nemirinê - Gilgameş gotiyê.

- Ez nizanim bê çi fêdeya te dê çêbibe - Ut - Napiştî bersiva wî daye - lê ger tu hevqas zêde dixwazê ez ji te re bibêjim, fermo rûne û gûhdarî bike.

Weha Ut - Napiştî destpêkiriye ku çarenûsa xwe ji Gilgameş re qal bike.

- Min, mîrîtiya bajarê Şurpaka dikir. Di wê demê de Xwedêyan biryar dabû, ku dinyayê di bin avê de bihêlin û qiyamet rabe. Eya - Xwedayê avê û zanînê ez tenê nehêliştim. Keremkire Şurpakê û hate qesrê. Çend caran li ser hev biryara Xwedêyan ji min re dubarekir û şîret li min kirin.

" Ut - Napiştî - Xweda Eya gote min - keştiyeke gelek mezin ji xwe re çêbike, çend ku dirêj bê, bere hevqas bilind û fereh jî be. Tê de her tiştê xwe kom bike - malbat û xizmên xwe jî bide hev. Ji dewarê xwe ji hemû heywanan cotekî jî bixe keştiyê û bizirê hemû mêw û hêşînahiyan. Roj dê werê û bi sibehê re, dê baranek ji remil û genim bibare. Wê gavê li keştiya xwe siwar bibe û hemû deriyan jî baş kilît bike."

- Min bi ya Xwedayê zanatiyê kir, min xelkê xwe komkir û destpêkir da keştiya herî mezin a dinyayê bidim çêkirin. Keştiya min heft tebeqî bû û tê de min her tiştên ku Xweda Eya qala wan kiribû komkir. Di dema avakirina keştiyê de min her tiştên xwe seferber kir. Keştî piştî demek dirêj tewabû û me ew berda deryayê. Gava ku baran a ji rimil û genim barî, tevlî malbat û xizmên xwe jî ez li keştiyê siwarbûm. Dema tîrêjên roja sibehê dan, li berbangê ewrên herî reş peyda bûn. Wan ber rojê jî girt. Her dever tarî bû, tariyek ji ya şevê reştir.

Li esmanan Xwedayê hilweşandinê, bi Xwedayê baran û bahozan ve birêve diçûn û temaşe dikirin. Dawî Xwedayê cîhana din perdeya ku her du cîhanan ji hev vediqetînê rakir û avê ser dinyayê tevde girt. Baho-

zek nedîtî hat, vê bahozê pêlên weha diavêtin ser mirovan, ku xelasî jê nebû. Av bi ser çiyayên herî bilind jî ket û di dinyayê de tiştekî ku bijiyan be nema. Em di keştiyê de li ser û li bin avê diketin.

Di şeş roj û heft şevan de bahoz û avê li ser rûyê dinyayê tiştek nehiştin. Di roja heftan de av rawesta, bahoz rawesta û... bêdengiyê desthilatî li ser rûyê erdê kir... Min li berxweda, hemû hêza xwe da hev û qepaxê keştiyê vekir, piştî hevqas roj tîrêjên rojê li rûyê min ketin. Ji rohnayiyê çavên min miç bûn, piştî demekê min karîbû ez çavên xwe vekim. Derdora keştiyê tenê av hebû, di durayiya ku çav dibîne de erd xuya nedibû. Tenê av, tenê av... Ez li ser kabokên xwe runiştim û min dest bi girî kir, heta roja nû hat jî, her rundik ji çavên min dihatin. Piştî dwanzdeh caran du saetan, keştî gihişte cîhekî ku av kêm bû bû. Gava min li derdorê temaşe kir, ez têgihiştim ku em hatine ber çiyayê Nîsîr. Çiya keştiya me dirawestand, lê derdora me dîsa her av bû. Şeş rojan bê ku biheje, bê ku bostekê bipêşve biçe keştiya me ji alî vî çiyayê bilind ve hatibû girtin. Di roja heftan de min kevokek rêkir, da perçeyek erd bibîne ji bo ku ber bi wir ve em bi rê kevin. Lê, kevoka me zû vegeriya, erd nedîtibû. Vê carê min kakilî bazan rêkir, ew jî zû vegeriya, bê ku erdekî bibîne. Dawî min qaj rêkir. Av jî, xûyabû ku kêm bû bû. Qaja me çû û bi paşve venegeriya, ez têgihiştim ku wê erdekî ku li deyne peydakiriye. Hingê jî min hemû çûk û teyr berdana ezman. Ez bi çiyê ve hinekî bi hewa ketim û min agirek mezin ji pûjan û biharatên din vêxist. Wê gavê Xwedêyan bêhna van biharatên xweş kirin û hemû li derdora çiyayê Nîsîr kombûn. Hatin

dora min. Xwedayê erdê Enlîl bi qehr li keştiyê meyze kir, ber bi min ve hat û qêrînek da :

- Çawa hinek mirov ji qiyametê xelas bûn e. Divabû kes nemîne.

Lê Xweda Eya bersîv da. Wî ji Xweda Enlîl re got : "Çima tu tûre dibî ? Min seredana Ut - Napiştî di xewna wî de kir û min sir a Xwedeyan ji wî re diyarkir. Ez bawerim ku tunekirina mirovayetiyê ji alî Xwedêyan ve, dê karek ne baş bû ya. Bere mirov cezayê xeletiyên xwe li ber Xwedêyan, gava di dawiya jiyana xwe de, hatin dad a xwe, bikşînin. "

Enlîl demek dirêj li Xweda Eya meyzekir, ecz a wî şikest û bangî min û jina min kir da bi kabokan ve em li pêş wî danişin. Bi van peyvan şukra xwe li me anî :

" Heta nuha Ut - Napiştî tenê mirovek bû. Ji nuha û pê de bere ew û jina wî bijibihin me. Bere wekî Xwedêyan nemir bin. Bere li girava di dawiya çeman de bijin û xwedî jiyanek bêdawî bin. "

- Wekî ku te guhdarî kir - Ut - Napiştî ji Gilgameş re got - ev destkeftina min a nemirinê paşî Qiyameta mezin çêbû, ya ku dawiya mirovayetiyê anî. Tê nuha çawa hemû Xwedêyan bide komkirin, da nemirinê diyarî te jî bikin ? "

- Birastî, gelo divê ez jî bimrim ( ! ) - Gilgameş carek din pirsî - Tu nikare bi tu awayî alîkariya min bikî ?

- Tu dixwazê nemir bê ? Hingê şeş roj û heft şevan ne xwe dirêj bike û ne xew bike.

Gava ev peyv bihîstine, Gilgameş bawer kiriye ku tiştek ji vê hesanîtir nîn e. Amade bûye ku bi ya Ut - Napiştî bike. Bê ku mirov şeş roj û heft şevan bixewê... û... bibe xwedî nemirinê ! Lê, berî ku bersîva Ut - Napiştî bide, xewek giran xwe avêtiye ser çavên wî. Westandina rê, hêz jê biriye. Çavên wî miç bûn e... û... bixewê ve çûye.

Ut - Napiştî li Gilgameş ê razay temaşe kiriye û ji jina xwe re gotiye :

- Tu li vî mêrê bihêz û girs meyze dike ? Raza ! Ger ez wî ji xew şiyar bikim, dê bawer neke ku xewê hêza wî biriye. Here her roj nanekî çêbike û deyne ber serê wî. Bi vî awayî gava şiyar bû, ew dê bizanibe ku çend rojan raza ye.

Jina Ut - Napiştî her roj nanek çêkiriye û daniye ber serê Gilgameş. Gava bûye roja heftan, nanê pêşîn ziwa bûye, yê duyem şîn bûye, yê sêyem kam bûye, yê çarem sipiyê girtiye ser, yê pêncem bêtam bûye, yê şeşem teze û yê heftem hîn germ bûye. Ut - Napiştî destê xwe daniye ser serê Gilgameş û ew ji xew şiyar kiriye. Gilgameş serê xwe rakiriye :

- Gava nû xewê xwe avête ser çavê min, te ez şiyar kirim!

Ut - Napiştî keniye û nanên li ber serê Gilgameş nîşan kirin e.

- Ka wan bihejmêre. Çend nan li ber serê te ne, hewqas roj tu di xew de bûyî.

Gilgameş serê xwe daniye ber xwe. Dilê wî ji qehran teng bûye :

- Şîretekê li min bike, Ut - Napiştî. Ez nuha çi bikim? Ez tenê li mirinê fikr dikim. Vî ramanî ji serê min bavêje.


Ut - Napiştî berê xwe daye Gilgameş û zû be zû bersîva wî nedaye. Lê, jina Ut - napiştî hew karîbûye xwe bigre û ji mêrê xwe tika kiriye, ku bersîva Gilgameş bide :

- Ya Ut - Napiştî, tu zanê ku bi çend kul, xem û êş' an Gilgameş xwe gihande gel te. Nuha jî, dê vegere mala xwe, bê ku tu bersîvek ji te girtibe û ev hemû kirinên wî da bighê ba me û hêviyên wî vala derkevin !

Wê gavê dilê Ut - Napiştî jî bi Gilgameş êşiya ye û bi ya pîreka xwe kiriye. Bersîva Gilgameş daye :

- Ez naxwazim tu ji vir vala vegerê. Ez naxwazim hêviyên te bişkihin. Ji ber wê ezê carek din şîretekê li te bikim. Di kurayiya oqyanusê de hêşînahiyek heye ya ku wekî gulê bi dirî ye, gelek stirî pê ve hene. Yê ku gezê ji vê hêşînahiyê bide, ciwaniya wî carek din li wî vedigere û dawiya jiyanê dê ji wî re tune be.

Bi bihîstina vê şîretê re, Gilgameş xatirê xwe ji Ut - Napiştî û jina wî xwestiye. Herweha tika ji Ur - Şanabî kiriye ku birêkevin. Her du dîsa li keştiyê siwarbûne û



ber bi oqyanusê ve çûne. Di nîvê oqyanusê de Gilgameş kevirên mezin û giran bi piyên xwe ve girêdane ku wî ber bi kurayiya oqyanusê ve bibin û xwe avêtiye nav pêlan. Kevirên giran ew kişandine kurayiya oqyanusê û wî li wir hêşînahiyek diye, ya ku jibehaye gulek bi dirî û stirî. Gava ew jêkiriye hîs kiriye ku qet dirî û stirî bi destên wî ve neçûn e. Hingê kevirên ku bi piyên xwe ve girêdane vekirine û azad ji giraniyê, ber bi jorayiya avê ve avjenî kiriye. Gava carek din bi keştiyê ve hilkeşiyaye, wî hêşînahî nîşanî Ur - şanabî kiriye.

- Di dawiya dawî de, va di destê min de ye, di dawiya dawî de hêşînahiya ku " pîran ciwan dike " tê binav kirin va ye bi min re ye. Ezê wê bibim bajarê xwe Uruk û bi gel re behr bikim. Ez jî , ezê geza xwe ji wê bidim û vegerim ciwaniya xwe. Va hêşînahî ya min e - Gilgameş kêfa xwe aniye - ez ciwanî û nemirina xwe di destê xwe de digrim.

Keştiya wan gihiştiye beravê û Gilgameş tevlî Ur - Şanabî ji keştiyê peya bûn e û rêya xwe birêve berdewam kirin e. Ber bi êvarê ve rûniştine da şîva xwe bixwin. Berî ku xwe dirêjbikin da razin jî, Gilgameş bîrek bi ava gelek cemidî û xweş peyda kiriye. Xwe bi bîrê ve berdaye, ji bo ku xwe bişo û paqij bike. Berî wê jî hêşînahiya bi qudret li ser geya daniye. Marekê jî, behna xweş a hêşinahiyê kiriye û ji avê xwe xijandiye û derketiye. Geza xwe ji hêşînahiyê daye, tevayiya wê qurpandiyê û bi rêya xwe ve çûye. Bi gezkirina wê ve çermê xwe yê kevn ji xwe avêtiye û çermek nû yê ku diberîqîne lê hatiye. Mar yekcar ciwan bûye.

Gilgameş xwe şiştiye û ji bîrê derketiye. Bi derketina xwe re xwestiye hêşînahiya xwe bigre dest, ji cîhê ku li wir hiştibûye. Lê nedîtiye! Şaşmayî û xemdar dest pê kiriye di navbera geyayê himbiz de li hêşînahiya ku dê ciwanî û nemirinê bidiyê de bigere. Bi dilêşî û kelagirî hatiye ba Ur - Şanabî.

- Ji bo çi bû ev hemû xem, ji bo çi bû ev hemû êş, Ur - Şanabî ? - Bi axîn Gilgameş peyiviye - Ji bo kê, min hevqas dilêşî kişand ? Tu tişt jî, min bidest nexist. Nemirina xwe di destê xwe de min digirt û wekî bayekî ji nav tiliyên xwe min revand.

Weha Gilgameş û Ur - Şanabî ber bi bajarê Uruk ve çûne. Piştî bîst caran du saetan runiştine da bixwin, piştî sî caran du saetan, xwe ji bo razanê dirêjkirine. Sibeha din dane rê û ji dur ve bircên Urukê, yên ku berhema Gilgameş bûn e, dîtin e. Bi vî awayî xemgîniya Gilgameş xwe daniye. Dilê wî rehet bûye, bi çavên bextiyar li bajarê xwe meyze kiriye. Ber bi Ur - Şanabî ve zîviriye û gotiye :

- Wekî hemû mirovan roja min jî ya dawî dê bê. Lê, jiyan û navê min dê di doz, kirin û berhemên min de bijîn. Doz, kirin û berhemên min di nemirina xwe de, dê navê min belav bikin.

*Ew kesê bixwaze li ser dîroka kevnare agahdar bibe, bûyerên wê dema herî kevn bizanibe, bere vê pirtûkê veke û bixwîne. Emê bihevre biçin kurayiya dîrokê, ji sê heta pênc hezar sal... ber bi avakirina şaristaniyê ve... Emê biçin xaka ku rojê xwedatiye herî mezin û herî bihêz li wir kiriye.*

*Edward Petîşka*

*Carekê li ser xaka navbera Dîcle û Firat, bîngeha şaristaniyê dihate danîn. Fîlosofan felsefeyên nu diafirandin. Astrologan stêrkên nu peyda dikirin. Sal behrî 12 mehan, meh bi 30 rojan, roj bi 24 saetan dikirin. Cara yekem nivîs li vir peydadibû. Matematîkzanan formulasyonên ku heta hingî nedihatin zanîn didîtin.*

*Gelek gel jî li ser xaka Mezopotamya dijiyan - Babîlonî, Asurî, Şumerî, Akadî, Mîdyayî...hemû jî azad û bextewar bûn. Berî sê - pênc hezar salan bû...*

*Cemal Batun*

ISBN 91-87730-39-1

**APEC**